



Stêrkoka li ser peyva jinê

Ev çend sal in, ji ber ku 8'ê Adarê bi gelek rêxistinên jin ên cur bi cur tê pîrozkirin û her rêxistin li gor bîr û bawerîya xwe tevdiqere, hin nîqaş li ser navê vê rojê û naveroka wê jî tên kirin. Hin rêxistin ku dibêjin 'jin' esas e, bi giştî dibêjin 'roja jinê'... *Munewer Azizoglu Bazan / R.2*



Mirin derbas dike?

Ûn ku Umberto Eco xwendibin, dizanin ku her pirtûkek wî çawa derya û arşîvek bêser û ber e. Jixwe ji romanên wî re jî "Eco-Roman" tê gotin lew bi serê xwe ekolek e. Lê li vir em ê tenê hevokeke wî ya ji Pandula Faucault ku xwedî naverokek dîrokî ye... *Mizgîn Ronak / R.3*



Bersiveke pêwîst

Vê hefteyê ez dixwazim bersiva hinek nirxandinên Îbrahîm Seydo Aydoganî ên der barê rêzimanê da bidim. Ev demek e, Îbrahîm Seydo Aydogan jî wekî gelek kesan der barê Rêbera Rastnivîsînê da bîr û boçûnên xwe bi zimanekî nîvhenekî dinivîse... *Samî Tan / R.5*

Rojnameya Heftane

www.xwebun.org

xwebûn

9-15 Adar 2020

Hejmar: 12

Buha: 4 TL

rojname@xwebun.org

Divê kurd bibin piyê sêyemîn

Mehmet Ocalan li Îmraliyê bi birayê xwe û Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan re hevdîtin pêk anî. Piştî 7 mehan bi Ocalan re hevdîtin pêk hat û Ocalan wiha got: "Hûn neçar in bibin hêz ku hûn karibin van pirsgerêkan çareser bikin. Em dibêjin mese dupê ye. Hûn neçar in bibin piyê sêyemîn ê meseyê. Ev bi çi dibe? Bi hêzê dibe. Heke vêya bikin dê bibe. Heke hûn ked bidin dê bibe."... *RÛPEL - 7*

Ger ziman ji holê rabe guneh ê kurdan e

Zimannas Michael L. Chyet der barê girîngiya ziman de bi kurdî bersiv da pirsên rojnameya me û wiha got: "Divê mirov bi zarokên xwe kurdî bide xwendin û stranên xwe bide guhdar-kirin û hezkirina xwe bo zimanê xwe û çanda xwe wergerîne ser zarokên xwe ango ser nîfşên nû. Heke kurd wiha nekin dibe ku zimanê kurdî piştî 20-30 salên din ji holê rabe. Hinek

kes jî dibêjin kurd zehf in û metirsiyek wiha tune ye, heke ez wisa nekim jî wê gelek kesên din wisa bikin ev yek şaş e. Divê her yek ji aliyê xwe ve wisa bike û li hêviya kesekî/e din nemîne. Heke her yek li benda kesekî/e din bîmîne dê zimanê kurdî ji holê rabe û ew yek dê gunehê kurdan bi xwe be, ne gunehê dewletên desthilatdar be."... *Hevpeyvin Rîzayê Xerî / RÛPEL - 4*



Duh, îro û sibê ya jinan e

Vîrus cîhanê ditirsîne

Vîrusa koronayê ku li Çînê derketibû holê li seranserê cîhanê belav dibe. Di van rojên dawîn de nemaze li parçeyên Kurdistanê nexweşî zêdetir bû. Li başûr û rojhilatê Kurdistanê gelek kes bi vê nexweşiyê ketine û li bakurê Kurdistanê nexweşî zêde dibe. Her çiqas dewlet hewl bidin nexweşiya vîrusê veşêrin jî êdî li her derê belav bûye. Ji ber vîrusê Kabeya Şerîf hat valakirin... *RÛPEL - 3*

Qêrîn û têkoşîna jinên li Amerîkayê ku di sala 1857'an de ji bo mafên xwe ketin grevê û têkoşîna jinan a heta roja îro tê dayîn jî ji vê rastiya dîrokî ne bêrî ye. Bêguman hemû rojên salê yên me ne. Ev roj wekî sembol û berdêla ked û têkoşîna jinan xwedî wateyeke mezin e. Nirxa mezinbûna tiştêkê bi dema wê re dikare bê pîvandin...

Reyhan Îke / RÛPEL - 2



Penaber kirine amûrê şantajê

Ji destpêka şerê li Sûriyeyê heta niha, dewleta tirk her tim li hember dewletên Ewropayê penaberan wekî şantaj bi kar tîne. Piştî ku li Idlibê derbên giran xwarin vê carê deriyên sînora vekirin û bi hezaran penaber sewqî ser sînora dewletên Ewropayê kirin. Dîmenên çuyîna penaberan û dîmenên penaberên li Edirneyê sekinîne trajediyek nîşan da. Trajediya li ser sînora ne xema kesê ye... *RÛPEL - 7*

Kurdayetî di Helbesta Melayê Cizîrî de

Helbestên Melayê Cizîrî kirin ku jiyana sor bidim ber dilê xwe û serê xwe li dîwarê hicrika seydayî bixim heya bibe xirxirk! Her dibêjim, "Wêje ji cîhanê mezintir e, Melayê Cizîrî jî ji wê-jeyê mezintir e!" Gava nêzîkî Dîwanê dibî, oqyanûsek diçelqile... *Selîm Temo / R.5*



Fîlm ji bo Heskîfê ne


Şaredariya Êlihê, Akademiya Sînemayê ya Rojhilata Navîn û Kolektîfa Sînema Nû hevpar di 25-29'ê adarê de Festîvala Fîlman a Yilmaz Guney a 8'emîn li dar dixin. Festîvalê dê li Navenda Çand û Hunerê ya Ahmet Guneştekîna Şaredariya Êlihê were birêvebirin. Bernameya Festîvala Fîlman a Yilmaz Guney hat aşkerakirin. Dê îsal di çarçoveya festîvalê de 13 filmên metrajdirêj, 17 belgefilm û her wiha 21 kurtefilmên bînan nîşandan. Temaya bingehîn a festîvalê Heskîfê e... *RÛPEL - 11*



Wûsar û Çemê Dicle

Demserrî çaraxînî, wûsara piya to zonena ke serra de neweyî dest pêkerda. Hama no wûsar, serva Heskîf, serva Dola Botan, serva çemê Dicle wûsare de bîno. Dewî ke par gucîke çemê Dicle de wûsar verwazî kerdî... *Meral Ozel / RÛPEL - 9*

Reyhan Îke



Duh, îro û sibê ya me ye

Asta kûrbûn, bilindbûn û dijiwariya êrîş û şerê pergala serdest a li hember çanda jin-dayikê, di heman demê de asta hêz û vîna jinê jî nîşan dide

Hinek tawan hene, dîroka wan kevnar û dirêj e. Nayên bîra me gelek. Lê em pir aşkera dikarin yekparebûn û zindîbûna dîrokê di bûyerên îro diqewimin de bibînin. Jixwe ev pê-naseya 'dîrok di roja me de, em di destpêka dîrokê de veşarî ye' tam jî behsa van rastiyan dike. Lewma ger em baldar bin, em dikarin van tawanan li gor vê rastiye bixwînin. Berqulipandin û vajîkirina dîrokê, kiriye ku heqîqet berovajî bibe û gelek tişt şêlû bibin. Zelalkirin û nîşandayîna heqîqetê, ji ber wê heta roja îro bûye sedema têkoşinê dijwar û ji bo xwegihandina heqîqetê berdêlên mezin hatine dayîn. Şewitandina 120 jinên li kargeheke bajarê New Yorkê jî vê rastiya diwar a têkoşina heqîqetê tîne bîra me.

Gelek caran bûyerên çêdibin tenê wekî encam li wan tê nihêrtin. Jixwe serkeftina hişmendîya serdestan di vê xalê de veşartî ye. Serkeftin ew e ku bi hezar salan awayekî lînerîna jiyane ya wisa bi me dane avakirin. Wekî gelek tiştên din, ev hişmendî jî bi me dane hînkirin û piştî em hatine hînkirin, pejiwandina tiştên din hêsan bûye.

Ger mirov behsa sînorên hizrî û hestyarî yê hatine xêzkirin û paşê di encama van de belavbûna ketî nav civaka mirovahiyê bizane, tiştên roja îro dikare baştir bîn fêmîkirin. Ji ber ev sînor bi gelek çîrok, mîtolojî, pirtûkên pîroz ên olî, paşê bi zanist, zagon û hiqûqê jî wekî heqîqet li ser me hatine ferzkirin û vegotin. Çîrok kevnar û dirêj e lê bi çend gotinan jî mirov dikare cewhera mijarê fêm bike. Gelek jî me nizanin ka cara ewil em çawa hatine 'kedîkirin' û dîlgirtin. Ev bûye sedem ku heta roja îro jî gelek sînor jî me re wisa bêgûneh û ji rêzê bîn xuyakirin. Lê mirovahiyê derbeya herî mezin jî sînoran xwar. Sînorên di hiş û hestan de dest pê kirin, paşê bûn sînorên malbatê. Bi rêzê, bûn ên gundan, eşîran, bajar, welatan û paşê bûn ên herêman. Sînorên di navbera civaka mirovan de hatin xêzkirin, bi vana jî bi sînor neman; sînorên di navbera serdest û


bindestan, hejar û dewlemendan, çîna jêr û çîna jor de hatin çêkirin. Paşê sînorên din lê zêdebûn; sînorên hizrî, sînorên hestyarî, sînorên biyanîkirina mirovan, zarok kirin dijberên dayikan... Ev sînor hemû li ser hîmê înkâr û nedîtina keda jinan hatin avakirin. Kedxwariya mezin, koletî û bindestîya mezin, mêtîngeriya destpêkê li ser keda jinê hat kirin. Yê ku jin afirandibû, bûn neyarên jinê. Lewma jin bû çîna bindest a yekem, zayenda yekem a bûyî mêtîngêh, kedkara yekem a destdirêjî li keda wê hatî kirin.

Çima jin? Ji ber jin serkanî û jêdera hiş û hesta avakirina civakbûna mirovahiyê bû; jin afirîner û xwedawenda ked û jiyane bû; civakbûn berhema ked wê bû. Jin nehatina înkarkirin; jî textê xwe yê xwedavendiyê nehatina xistin; nebûya kole, mêtîngêh, çîna jêr, zayenda duyem û nirx û rûmeta jînbûnê nehatibûna bevajîkirin, an ku heqîqet nehatibûna şêlûkirin, rêya kedxwarî û mêtîngeriya venedibû. Çanda zilamsalariyê serkeftina xwe li ser vê berevajîkirina heqîqetê ava kir. Bingeha mêtîngeriya ya heta roja me ya îro jî xwe dispêre vê rastiya dîrokî. Bi înkara keda jinê re pêşî li her awayê kedxwarî û mêtîngeriya, şer, zilm û zorê, bêmafi û de-

rewan, destdirêjî û xayîntiya li civakê hat vekirin.

Jin-dayika afirîner a hemû pêdiviyên jiyane ji bo civaka mirovahiyê afirandî, hat înkarkirin. Dema mîtolojîyan tijî serpehatî û çîrokên şer û pevçûna jinan a li hember vê xayîntiya mezin in. Paşê bi rêya olan bû pêvekek ji parsûyê zilam û li ser wê heta niha jî bi hezaran derew tîn kirin. Paşê pergale mêtîngêr û serdest piştî xwe dan van derewên xwe û spartî zanist, zagon û hiqûqê. Jin jî hemû qadên jiyane hatin dîrxistin, jina jiyane afirandî, jî hemû mafên jiyane hat bêparhiştin, bû xidam û zimmetkara pergala serdest. Hêza tu li hember şer dikî çiqas mezin be, tu bi hêzek ewqas mezin bi ser de diçî. Asta kûrbûn, bilindbûn û dijiwariya êrîş û şerê pergala serdest ê li hember çanda jin-dayikê, di heman demê de asta hêz û vîna jinê jî nîşan dide. Tevî ku pênc hezar sal in bînavber ev çanda mirovahî afirandî, bi her awayî jî aliyê hişmendî û hestyarî ve tê bombebarankirin lê tu demê bi tevahî jî holê nehat rakirin. Kengî jinan derfet dît ji bo heqîqetê tîbikoşin, ev xayîntiya mezin a li wan hatî kirin jî bîr nekirin.

Qêrîn û têkoşina jinên li Amerîkayê ku di sala 1857'an de ji bo mafên xwe ketin grevê



û têkoşina jinan a heta roja îro tê dayîn jî ji vê rastiya dîrokî ne bêrî ye. Piştî vê bûyera bijan, di 26-27'ê Tebaxa sala 1910'an de, li Danîmarkayê bajarê Kopenhagê Konferansa Jinên Sosyalîst a Duyemîn hat lidarxistin. Clara Zetkîn jî bo bîranîna van jinan pêşniyar kir ku roja 8'ê Adarê bibe Roja Jinên Cîhanê û pêşniyara wê di konferansê de hate pejirandin. Piştî wê cara duyem di Konferansa Jinên Sosyalîst a Sêyemîn de ji aliyê serokê şoreşa Bolşevîkan û damezirînerê Yekitiya Sovyetê Lenîn ve di sala 1921'î de li Moskowê hat pêşniyarkirin. Navê wê jî wekî Roja Jinên Kedkar ên Cîhanê hat guhertin. Heta salên 1960'an jî li gelek welatan pîrozkirin û bîranîna wê rojê qedexa bû. Paşê di encama têkoşin û berxwedanê jinên cîhanê de, bi taybetî berxwedana jinên li Amerîkayê, Neteweyên Yekbûyî neçar ma ku di 16'ê Kanûna sala 1977'an de wê rojê bi fermî bipejirîne.

Bêguman hemû rojên salê yê me ne. Lê ev roj wekî sembola berdêla ked û têkoşina jinan xwedî wateyê mezin û bi nirx e. Nirxa mezinbûna tiştêkê bi dema wê re dikare bê pîvan. Niha hema bêje li hemû cîhanê di asteke bilind de xwedî li wê rojê tê kirin. Lê divê mirov keda bi sedan salan jî bîr neke û wekî mîrate-

yeke pîroz, bikaribe her tim lê xwedîtiyê bike.

Di vê wateyê mirov dikare bêje ku jinên kurd ên şîrhelal bi zanebûneke dîrokî û zanistî di asteke bilind de xwedîtiyê li wê kedê bike. Her wiha yê ku wê rojê herî bi çû û bi awayekî rast pêşwazî dikin, jinên kurd in. Îro jinên kurd li ser wê daneheva têkoşin û berxwedana jinan a bi hezarê salan di asteke bilind de li wê rojê xwedîtiyê dikin û nûneriya ked û têkoşina jinan dikin. Li ser hîmê bîrdoziya azadiya jinê, jina kurd li hember pergale serdest hêza herî bîrêxistinî ye. Xwedî partî û rêxistin, xwedî artêş û hemû derfetên têkoşina azadiyê ye. Li hember derewên pergale serdest, hişmendîya wan a li dijî heqîqetê û zanista wan a pozîtîvist, jinên kurd bi zanista jîneolojiyê, li hember pergala yekdestî û koledar, bi modela hevserokatiyê, li hember newekhevî û zayendperestiyê, bi nûneriya wekhev, li hember mêtîngêrî û şerê qirêj, bi şerê parastina rewşa di her qada jiyane de, di warê dîrokî, zanistî, siyasî, aborî, civakî û leşkerî de wekî hêzeke sereke cihê xwe di jiyana civakê de digirin û her wiha di têkoşina azadiyê de rola pêşengiyê dilîzin. Ev hêz û vîna jinên kurd, hêvî û baweriyê mezin dide jinên cîhanê jî.

Em jin cewhera heqîqetê ya duh, îro û sibê ne

Em firş û haveynê azadiya civakê bi xwe ne

Em ne darên şikestî, stûnên jiyane bi xwe ne

Em parastvanên rast ên mirovbûn, wekhevî û vîna

Awaz û stranên bedewî, xweşîkbûn, rûmet û evîne

Dijberên şer û mêtîngeriyan, dilên aramî û kenîne

Di hemû zemanan de em hebûn, em hene, em ê hebîn

Em ê her li pey doz û têkoşina rûmet û keda xwe bin

Bi vê keda me, wê duh, îro û sibê jî her ên me bin...

Ev çend sal in, ji ber ku 8'ê Adarê bi gelek rêxistinên jin ên cur bi cur tê pîrozkirin û her wiha her rêxistin li gor bîr û bawerîya xwe tevdiqere, hin nîqaş li ser navê wê rojê û naveroka wê jî tîn kirin. Hin rêxistin ku dibêjin 'jin' esas e, bi gîştî dibêjin 'roja jinê'. Yê ku dibêjin, 'na mijara çîn û karkeran bingeh e', navê 'jinên kedkar' bi şid diparêzin. Rêxistinên ku balê dikîşînin ser têkoşina hemû jinên cîhanê dibêjin 'roja navneteweyî ya jinan'. Yê ku dibêjin ev rojêke femînîst e, wek 'roja femînîstan' bi nav dikin. Yê têkoşinê diparêzin, dibêjin 'roja jinên têkoşer'. Û herî dawî yê ku naxwazin bi tu bîrdozî û zayendê ve wê rojê girê bidin, tenê dibêjin '8'ê Adarê'.

Ango jî jinên bûrjûva bigire, heta yê karker, jî yê femînîst bigire heta yê dij-femînîst, jî jinan tenê bigire heta gelek mêran, gelek komên cihereng xwe di pênaseyên 8'ê Adarê yê cuda de dibînin.

Bi taybetî bi bilindbûna rexneya li ser heteronormatîvîteyê ku kategoriya 'jin û mêr' hem wek zayenda cînsî



Bijan
Munewer Azîzoglu
Bazan

Stêrkoka li ser peyva jinê: Jin*

û hem jî wek zayenda civakî red dike û dibêje zayend li gor dualitiya zayendan hatine sazîkirin; hemû rolên ku civak û biyolojî li ser jin û mêr wek zayend ferz dike, red dikin, navê 8'ê Adarê bû mijara nîqaşê. Ev pêla postfemînîst ku jî xwe re queer jî dibêjin, sedemên newekhevîyê ne di bavîksalariyê de, lê di heteronormatîvîteyê de dibînin. Dibêjin heteronormatîvîteyê ku li gor berjewendiyên zilam xwe bi teşe kir, bavîksalariyê jî ava kir. Ev nîqaşêke berfireh e û têrî wê quncikê nake, lê tişt a ku ez dixwazim balê bikişînim ser, şaneya *(stêrkok) e ku ev kesên kategoriya jin û mêr wek zayenda avakirî red dikin, bi wê stêrkokê xwe pênase dikin û her wiha têkoşina me ya bi hev re ya bi stêrkokê re ye.

Lewra jî ber ku ev kes û rêxistinên

queer xwe li derveyî zayendên xwe yê biyolojîk (çi jin, çi mêr) pênase dikin û di heman demê de xwe di têkoşina azadî û wekhevîyê de wek tîfaqa jinan dibînin piştî peyva jinê bi stêrkokê (*) xwe pênase dikin: Ango wek "Jin*". Divê ev stêrkok bi vî awayî hemû kesên ku xwe li derveyî zayendên hetero (jin û mêr), kesên trans, înter, homoseksuel, biseksuel û hwd., pênase û destnîşan bike.

Tevî rexneyên pratîkî û teorîk li queer femînîzmê tîn kirin, li gor min di têkoşina azadiya jinan û bindestan de yek jî tîfaqên herî bi wate jî tîfaqa bi stêrkokan re ye. Lewra di navbera heteronormatîvîteyê û bavîksalariyê de tîkiliyê yekser heye. Bavîksalariya bi normên heteronormatîv xwe bi sazi dike. Derketina li dijî wê dualitiyê, di

heman demê de li dijî serdestî û bindestiyê derketin û li hember 'norm'ê sekinandin (beramberî wê yê derveyî 'norm'ê naskirin) e. Pîrî caran ev helwesta sekinandina li derî normê, jî hêla rêxistinên jinan û femînîstan ve bi guman tê şopandin. Heta tê gotin, ev helwest nasnameya jinê ku bi têkoşina sedan salan hatiye bidestxistin, dixê xetereyê. Lewma dema kesên queer bi gotina 8'ê Adarê ve piştî "queer-femînîst" şaneya "*" jî pê ve kirin, jin gotin, "8'ê Adarê jî ji dest çû!"

Bîrêz Abdullah Ocalan di analîzên xwe yê der barê jineolojiyê de dibêje dîtina jinê tenê wek zayendê ku biyolojiya xwe cuda ye, korîtî ye. Têkiliyên serdestî yê di navbera jin û mêrî de wek sedema bingehîn a newekh-

eviyê dinirxine. Girêdayî wê zayendperestiyê wek bîrdoziya desthilatdariyê dibîne. Ev tespita der barê sedema newekhevîyê bi ya queerê ve digihîje hevudê. Heta di mijara 'kuştina zilamî' û 'kuştina jina heyî' de redkirina 'jînantî û mîrantî'ya heyî heye. Lewra hem jînantî û hem jî mîrantîya heyî di her du zayendan de jî mewcûd e. Pênaseya jinê di heman demê de pênaseya mirovan bi gîştî ye. Ango dema jinê "azad, wekhev û demokrasiyê di xwe de bicîhkirî" pênase dike, di heman demê de terîfa mirovê azad dide. Ev taybetmendî mirov nikare bibêje ku biyolojîk e, an jî tenê aidê zayendê ye. Bi gotineke din, em wek jinên kurd li dû avakirina jina azad, mirovê/a azad û civaka azad in. Lewra jî di 8'ê Adara jinên kurd de gelek nasname hene: Roja navneteweyî ya jinên têkoşer, kedkar, femînîst û stêrkok (*)'an e. Nasnameyên li dijî zayendperestiyê, li dijî bîrdoziya zilamê spî yê serdest tîdîkoşin û di lêgerîna civaka azad de ne, tîfaqên me ne. 8'ê Adarê bi stêrkokan hîn rengtîr e.

Korona Rojhilat û Başûr ditengijîne

Berbelavbûna vîrusa koronayê berdewam e. Li başûr û rojhilatê Kurdistanê jî weqayên vîrusê hatin dîtin. Li Başûr jî bo pêşlêgirtina vîrusê serdananên nexweşan hatin rakirin

Navenda Nûçeyan

Vîrusa koronayê ku di dawiya sala 2019'an de li Çînê peyda bû, welat dane ber xwe û berbelav dibe. Vîrus, ji bilî parzemîna Antartîkayê, li tevî parzemînan zêdetirî 80 welatan belav bûye. Li gorî dane-yên dawîn; vîrus bi zêdetirî 95 hezar kesan re hatiye dîtin û pirani çîni zêdetirî 3 hezar kesan jî ji ber vîrusê jiyana xwe ji dest dane.

Ji bilî Çînê welatên herî zêde vîrus li wan belav bûye û gelek kes ji berê jiyana xwe ji dest dane welatê Ewropa Îtalya û welatê Asyayê Îran in. Li her du welatan jî ji ber vîrusê hemû dibistan hatin girtin û her cure aktivîteyên werzişê hatin qedexekirin. Li Îtalyayê dêr li ayînan re û li Îranê jî mizgeft li nimêjan re hatin girtin.

Li Kendavê belav bûye

Ji bilî Îtalyayê, li gelek welatên din ên Ewropayê jî weqayên vîrusê hatin dîtin. Dîsa Iraq jî di nav de li welatên Kendavê yên nêzî Îranê jî gelek weqayên vîrusê hatin dîtin. Hem li Ewropayê û hem jî welatên Kendavê li dijî vîrusê bergirî hatin zêdekirin û gelek bernameyên komî hatin betalkirin. Girêdayî vîrusê gelek seferên balafirana jî bo demekê hatin rawestandin.

Kabeya Şerîf vala ma

Bergiriyên herî balkêş li Erebiştana Siûdî hatin girtin. Bi guman vîrusê li Erebiştana Siûdî serdananê umreyê jî bo demeke nediyar hatin rawestandin. Ji ber vîrusê yekê Kabeya Şerîf piştî demekê vala ma. Erebiştana Siûdî, di rojên pêş de ji bo wezîfeya olî ya hecê ya misilmanan jî biryara xwe aşkera bike. Heke mudaxaleyî vîrusê neyê kirin dibe ku îsal wezîfeya hecê jî bê betalkirin.

Rojhilat

Weqayên vîrusê yên li Îran û Iraqê, gihîştin rojhilat û başûrê Kurdistanê jî. Li gel agahiyên kêm jî tê gotin ku li bajarên Rojilat jî weqayên vîrusê hene û bergiriyên pêwîst ji bo vîrusê nayên girtin. Ji ber vîrusê gelek li Rojhilat li dijî rejîma Îranê bi bertek in û daxwaz dikin ku demildest bergiriyên pêwîst di asta herî jor de bên girtin. Di nav hefteyê de parlamenterê bajarên Sine û Nexede yên Rojhilat Ebdulkerîm Hisên Zade, bergiriyên kêm ên li Rojhilat rexne kir û xwest ku herêmên weqa li wan hene bikevin karantînayê.

Başûr

Li Başûr jî mîna Rojhilat weqayên vîrusê hene. Lê li vir jî aliyê Rêveberiya Herêmê ve



gelek bergirî hatin girtin. Ji aliyê Wezaretê Tendurîstiyê ya Herêma Kurdistanê ve li Hewlêr û Silêmaniyê serdananê nexweşan hatin rakirin. Li Silêmaniyê jî 116 kesên ku bi guman vîrusê 14 rojan li nexweşxaneyan hatin girtin jî ji ber ku di kontrolên taybet re hatin derbaskirin û piştrast bû ku bi vîrusê neketine, ew şandin malên wan.

Bakûr

Li bakûrê Kurdistanê hê bi awayekî fermî weqayên vîrusê nehatine ragihandin. Li gel vîrusê yekê jî tê angaştîkirin ku li bajarên

mîna Amed, Wan, Mêrdîn û Xarpêtê weqayên vîrusê hene lê ji aliyê dewletê ve ser weqayên tê girtin. Têkildarî wê mijarê li ser medyaya civakî gelek angaşt û qeydên dangan li ser medyaya civakî hatin belavkirin.

Rojava

Li Rojava jî hê weqayên vîrusê nehatine dîtin. Lê berevajiyê beşên din ên Kurdistanê heke vîrusê bê dîtin dê bibe sedema karseteke mezin. Lewra li vir bi hezaran kes di kampên de, di nav şert û mercên nebaş û zehmet de dijîn.

Nivîsandin an jî nenivîsandin

Hisên Çatikkaş

Li vir em ê li ser çend xalên nivîsê bisekinin, an jî yên nenivîsandinê. Em kurd çima nanivîsîn? Civanên kurd çima berhem û metnên kurdî nikarin zêde bikin? Çima di rojname, kovar û internetê de cureyên nivîsên bi kurdî zêde nabin? Heke zêde bibin jî ji aliyê nivîskar û helbestvanên xwe îspatîkirine ve tînanivîsandin. Gelo çima navên nû li nivîskar û helbestvanên kurd zêde nabin? Di pey van pirsan de, li ser şopa nivîsê û bi hêviya nivîsê nû ku li kurdî zêde bibin em ê dest bi nivîsa xwe bikin.

Ji ber ku dîroka nivîsê dirêj e, em zêde qala dîrok û guherînan derbasbûyî nakin. Lê bi çend hevokan jî be em dikarin qala derketina nivîsê û tînkiliya di navbera mirov û nivîsê de bikin. Dema mirov li dîrokê dimezêne mirovan jî bilî deng, pêwîstî bi bikaranîna sembolên cuda dîtine. Ango tenê deng tîra xweifadekirin û lihevkerînan mirovan nekirine. Ji ber wê jî mirovan serî li sembolên cuda dane. Wek mînak mirovan li ser dîwarên şikeftan bi wêneyan, xwe îfade kirine, an jî bi girîkên tayî tişt hejmartine. Piştî lêgerîn û ceribandinê dirêj wêneyên şikefta nivîsa bizmarî bi pêş ketiye. Nivîsa bizmarî cureyê nivîsê ye ewil e. Nivîsa bizmarî bi darîkên zirav li ser tabletan hatiye

nivîsandin. Nivîs bi keda hezaran sal û mirovahiyê derketiye holê û hatiye roja me ya îro. Baş e, çî ye ev nivîs? Ango em dikarin nivîsê çawa pênase bikin?

Nivîs bikaranîna hinek îşaretan, bi awayekî sistematîk, şeweyê xweifadekirinê ye. Her wekî din em dikarin bêjin ku nivîs, tespîtkirina raman a bi îşaretan e. Bi awayekî rêkûpêk nivîsandina tîpan, nivîsê derdixê holê. Di roja me ya îroyîn de rêjeya xwendin û nivîsandinê pir bilind e. Ji ber vîrusê nivîs ketiye nav jiyana mirovan. Lewma jî heke mirov bi nivîsê re eleqedar nebin jî nivîs bi mirovan re eleqedar dibe. Ango em dikarin bêjin ku tînkiliyêke diyalektîk di navbera mirov û nivîsê de heye. Lê mixabin ev diyalektîka di navbera mirov û nivîsê de her çiqas jî aliyê nivîsê ve xurt bû jî aliyê mirov ve qels dimîne. Nivîs her kêliyê xwe nişanî mirov dide, lê gelek caran mirov wê jî nedîtûye. Di sedsala bîst û yekem de mirov mecbûrê nivîsê ye. Pêwîstî bi xurtkirina tînkiliya mirov û nivîsê heye.

Bi dehan cureyên nivîsê hene. Ji bo hest û ramana nivîskar kîjan cureyê nivîsê kêrhatî be, hewce ye bi vîrusê cureyê binivîsê. Li gorî cureyê hatî nivîsandin nivîs; li rojname, kovar, çapemeniya civakî û blogên şexsî tînanivîsandin û wek pirtûk jî

dikarin bên çapkirin. Piştî van tiştan pêwîst e, em bipirsin ka çima em nanivîsîn? Gelek tişt hene ku pêşî li nivîsandina kurdî digirin; ev tişt carinan wek dewlet derdikeve pêşiya me, carinan wek mantiqê zimanekî din, carinan wek xweferzkirinê nivîskarên zimanê me, carinan wek derûniya bindestiya me û carinan jî wek xwesansûrkirinê. Lewma divê beriya her tiştî em xwe ji derûniya bindestiyê xilas bikin. Piştê jî bêjin: bihêlin bila em çend şaşiyên rêzîmanî bikin, bihêlin bila çend hevokên me bi mantiqê zimanekî din bin, bihêlin bila çend hevok ji zimanê labaratuarê!!! an jî kurdiya akademîk!!! bin.

Heta ku mirov şaşiyên nekin dê nikarin rastîyan jî bikin. Ji ber wê çendê qedir bidin nivîs, berhem û nivîskarên nû da ku ji wan nivîsê qerase derkevin. Helbet kêmasiyên wan bibêjin, lê nebin sedem ku dest ji nivîsandina zimanê xwe berdin, nebin sedem ku berê xwe bidin nivîsandina zimanê ku bi salan pê xwendine û nivîsandine.

Kurdî behr-deryayêke bêserî û bêbinî ye. Ji ber vîrusê ne hêsan e ku mirovek di vîrusê de şaşî û kêmasiyên neke. Şaşî û kêmasî nebin jîyan gûzeke pûç! Pêvajoya dîtina kehrebê ya Edîson pirani

xwîner dizanin, ji ber vîrusê hewce nake ku em li vir qal bikin. Lê tevî hemû ceribînan (ev ceribînan carinan jî ber şaşiyên carinan jî ji ber kêmasiyên dubare dibin.) Edîson digihîje armanca xwe. Kesên ku dixwazin bi kurdî binivîsin dê bigihîjin armanca xwe. Lê piçeki berxwedan û sebir. Ew kesên ku nû dest bi nivîsandina zimanê xwe dikin, divê ji rexneyên tûj re amade bin. Ji van rexneyan, yên çêker bila ji xwe re bigirin û heta dawiyê sîdê ji wan werbigirin, yên di nav de heqaret hebin bila piştguh bikin.

Wek encam; bi kurt û kurmancî nivîsandin karekî cidî ye. Divê mirov li gorî vîrusê nêzikî nivîsandinê bibe, nexasim nivîsandina bi kurdî zêdetir cidiyetê dixwaze. Nivîskarên kurdî divê her roj bixebitin. Çawa misliman dibêjin "Te îro ji bo Xwedê çî kir?" Divê nivîskarên kurdî jî her roj beriya ku rakevin pêrsê ji xwe bikin: "MIN ÎRO JI BO KURDÎ ÇI KIR?" Ango divê her roj ji bo kurdî tiştêkî bikin. Qene di behra kurdî de noq an jî binav nebin. Heke wê şevê bi ûcdaneke rehet rakevin wê demê ew ber bi nivîskariyê ve gavên biewle diavêjin. Na, heke tiştêkî nekirin û ûcdan reht be, bila wê demê xew li wan biherime da ku ew şev li pêşiya gavên nivîskar ên bi ewle nebin asteng. Nivîskarî ne hêsan e, keda salan dixwaze ji bo ku rûpelên lî-nûskê tîr û tîjî dagire. Bi gotîneke din divê nivîskar bi salan bixwîne û binivîse da ku tîrîkê hişê xwe tîjî peyv, gotin, metelok, mamik, çîrok, destan û hwd. bike. Dema li ser meseya xwe tîrîkê hişê xwe ye ku ji folklorê kurdî vebike.

Mirin derbas dike?

Mizgîn Ronak

Ên ku Umberto Eco xwendibin, dizanin ku her pirtûkek wî çawa derya û arşîvek bêser û ber e. Jixwe ji romanên wî re jî "Eco - Roman" tê gotin. Ew bi serê xwe ekolek e. Lê li vir em ê tenê hevokêk wî ya ji Pandula Faulcault ku xwedî naverokek dîrokî ye bidin pêşiya xwe û li ser bifikirin: "Ku tu mirî dê derbas be" yan jî "ku tu mirî tu yê ji bîr biki." Di dema zarokatiyê de ev hevok wiha derbas dibe: "Ku tu mezin bibî tu yê ji bîr biki."

Gerçî meriv mezin dibe jî ji bîr nake lê belkî mirin karibe bibe derman! Mînak; meriv dê çî ji bîr bike? Dêr û kulan, tenêbûna qefesê yanî bedenê? An demborîtiya her tiştî û nesekinîna zeman? Dema meriv dikeve xewê jî her tişt jî bîr dibe yan jî her tişt 'derbas dibe' lê çî feyde! Çawa şiyarbûnî tî, her tişt jî cihê ku lê maye berdewam dike. Lew xem, tenê dikare bo demên kurt bibe stare ne ji bo demên dirêj. Lê diyar e ku mirin ne wisa ye. Ji bo ku bi her awayî jî vîrusê heyî rizgarbûnî ye bi rastî jî 'derbas dike' dide jîbîrkirin!

Ne ku ez pesnê mirinê didim, jixwe pêwîstiya mirinê bi tiştêkî wiha jî tune ye lê lazim e ku em mirinê êdî wekî travma yan jî felaketek nebinin û tenê dema ku 'hat serê me' nas nekin û hawaran neşînin erd û aşîman. Wekî ku dapîra min digot; "Em ji bo mirinê, mirin ji bo me" yanî tînkiliyêk sîmbiyotîk (hevtêrker, hev pêşdebir) heye di navbeyna mirin û çêbûnê de lê ji ber tiştên ku bi me didin ezberkirin ew tînkilî kor dibe û tenê zarezar û dramatizekirin dimîne. Ger dram be, çêbûn bi xwe jî dram e, qedandina tiştêkî din, veguhezîna tiştêkî dinê ye. Jixwe li hin derên dinyayê dema zarok çêdibin şîna wan dikin û dema ber bi mirinê ve diçin jî şahiyê li dar dixin. Yanî rastî carna ne rast e! Lew tiştê ku em jê re dibêjin rastî, li ba hin kesên din şaşî ye, li ba vedara xwezayê ya bêdawî jî.

Erê ku em bimirin e derbas bibe ku em bimirin em jî bîr bikin! Çî? Mesela nasnameya kurdbûnê ya ku ne rehetî û huzûr dide xwe ne jî dide me, piştî mirinê dikare çî bike? Ew jî encax bi me re razê ne wisa?

Îcar di pirtûka navborî de leheng hem ciwan û zanyar e hem zarokêk wî yê biçûk heye hem jî jî evîndara xwe pir hez dike lê kujer bi pey wî ketine û kuştina wî li ber derê ye. Belam xwe navêje nav xembariyê û dibêje; "Ku bimirin e derbas bibe ku mirin were yê derbas bibe." Paşê dilê wî jê re dibêje; "Dîsa jî pir zor e." Diqehire û dibêje; "Serê wê bixwe! Dizanin ku pir zor e lê ku bimirin e derbas bibe."

Pirtûka ku nêzî hezar rûpel e kuştina wî 'nade' lê dîsa jî mirov dizane ku miriye û êdî xilasbûyî ye. Loma jî ev rastîya mirinê di bîra mirov de bi cih dibe û mirov tînkiliyêke ku tewreyek jîyanê ya nû ye, xelasiye. Belkî em dibêjin qey çîrokên li vî alî nivî dihele lê na nivîmayîn jî tiştêkî îzafî ye. Ger em bi çavek nivî mîze bikin her tişt nivî ye lê ku her bûyîn destpêkek nû be, tu nivîmayîn nîn e. Tiştê ku em dibêjin nivî, jî ber ku em dibêjin qey nivî ye wisa ye, ne ji bo ku bi rastî jî wisa ye. Her tişt xwe temam dike û vediguherîne bûyînekî din. Loma jî mirin 'derbas' dike baş dike. Loma em jî bo wê ew jî bo me ye. Jixwe ku em tenê li giyayan jî binêrin em ê bibînin ku di xwezayê de mirin tune ye, her tişt bi awayekî bi rêkûpêk di nav guherînê de ye lê mejiyê însanê jî xwezayê dîrketi 'mirin' peyda kiriye.

HEKE ZIMANÊ KURDÎ JI HOLÊ RABE GUNEH Ê KURDAN E

Zarokên xwe hînî kurdî bikin

→ Rizoyê Xerzî

Divê hemû dayik û bavên kurd bi zarokên xwe re tenê bi kurdî bipeyvin. Li derve dikarin bi zimanekî din bipeyvin lê mirov dikarin biryar bidin ku di nav mala xwe de tenê bi kurdî biaxivin û mirov ji wan re bêje heke tu bi zimanekî din bi min re biaxivî ez bersiv nadim

Michael L. Chyet
kî ye?



Zimannas Michael L. Chyet di sala 1957'an li Cincinnati, Ohio ya Amerîkayê hatiye dinyayê. Li gel gelek zimanên ewropî ew bi zimanê erebî, ibrani, tirkî, farisî, kurmançî û soranî jî baş dizane. Beriya demekê ferhenga wî ya kurmançî-îngilîzî ji aliyê weşanxaneyê Yale University Press ve li Amerîkayê hatiye çapkirin. Di ferhengê de peyvên kurdî bi tîpên latînî û erebî hatine nivîsandin. Demekê wekî berpirsê beşa kurdî ya Radyoya Dengê Amerîkayê xebitiye. Her wiha wekî profesorekî cihê xwe di nav xebatên zanîngeha Washingtonê û Enstîtuya Kurdî ya Parisê de girtiye. Li pirtûkxaneyê Kongreya Amerîkî li Washingtonê kar dike.


Mêvanê me yê vê hejmarê jî di sala zimannasekî hêja ye ku herçî fehemberî xwe bûye, meraqa wî çûye ser hînbûna zimanan û ji bilî kurmançî û soranî ew bi derdora çil zimanên cuda yê Rojhilata Navîn û deverên cuda yê cihanê dizane. Me xwest ji bo xwendevanên xwe vê hevpeyvîne bi rêzdar Michael L. Chyet re bikin. Kerem bikin em bi hev re bala xwe bidin bersiv û şîretên zimannasekî.

Di nav de du zaravayên zimanê kurdî hem kurmançî hem soranî, tu bi gelek zimanan baş dizanî, ev meraq an jî hezkirina zimanan ji ku peyda bû?

Dema ez 5-6 salî bûm dayik û bavê min ez şandim xwendegeheke taybet ji bo hînbûna zimanê ibrani. Wiha ez nivê rojê zimanê ibrani nivê rojê jî zimanê îngilîzî hîn dibûm. Min şeş salan li wê xwendegehê xwend. Piştî ku ez derbasî dibistaneke navendî bûm û min latînî xwend, ez mecbûr bûm hînî latînî bibim û gelek hêsan bû bo min. Her wiha wê salê min dest pê kir hînî çend zimanên din jî bibim wek almanî, fransî û spanî, rûsî û yidiş ango zimanê cihûyên rojhilatê Ewropayê. Zimanê bapîrên min e. Sala piştî wê gava ez 13 salî bûm em çûn 8 mehan li Israîlê jîyan û berî ku em biçin bavê min ji min re got tu ji zimanan hez dikî û li Israîlê ji bilî ibrani zimanê erebî jî heye tu dikarî hînî wî jî bibî. Piştî wê min dest pê kir ku hînî zimanê erebî bibim û ew yek bû destpêka meraqa min ji bo hînbûna zimanên Rojhilata Navîn.

Wekî tê zanîn tu bi gelek zimanan dizanî, hin çavkanî dibêjin 30 hin jî dibêjin nêzîkî 40 zimanan baş dizanî. Bi rastî tu bi çend zimanan baş dizanî?

Bê henk jî ez naxwazim zimanan bijmêrim ji bo ku ez xwe netirsînim lê di rastiyê de ez texmîn dikim ku min heta niha nêzîkî çil ziman xwendine. Lê ez bi hemiyar baş nizanim. Ez 10-12 ji wan baş diaxivim. Zimanên Rojhilata Navîn wek erebî, ibrani, tirkî, farisî, fransî, almanî, spanî, yidiş, rûsî, holandî û kurmançî, soranî (li vir ez dibêjim heke em karibin kurmançî û soranî wekî du zimanên cuda bijmêrin ew jî teşqeleyeke din e lê xwezî hemû teşqeleyên me wekî yê yekê bûna). Ez gelek hez ji zimanên Belkanan jî dikim wek bulgarî, sirbî, makedonî, korwatî, elbanî, hingarî, italî, yûnanî (ya kevin û ya nû) û hinekî polonî û swêdî. Lê nikarim ku bêjim ez wan baş dizanim. Ez hinekî bi zimanên din ên afrikî dizanim ji bilî erebî ez amharî zimanê Etyubiyayê û hinekî siwahilî jî dizanim û piçekî hewsayî jî lê min ew ziman ji bîr kiriye ji ber ku ji zû de ez pê napeyvim. Ji zimanên Amerîkayê (zimanên sorpêstan) divê em vê gotinê bi kar neyînin ji ber ku ne bi dilê wan e lê mebesta min xelkên resen ên Amerîkayê ango hindiyên sor an jî hindiyên Amerîkayê tenê zimanê çerokî min xwendiyê û ji zû de min bi kar neaniye û behra bêtir min ew jî bîr kiriye.



Berî niha jî hîn ferhengên îngilîzî-kurdî hatine çapkirin, gelo çi cudahiya vê ferhenga te ji yê beriya xwe heye?

Ferhenga Birûskî çapa duyem a ferhenga min bi xwe ye, ew gelekî berfirehtir e û şaşiyên di çapa yekem de hatine sererastkirin. Ew jî sê bergan pêk tê yekem û duyem kurmançî-îngilîzî ne û ya sêyem îngilîzî-kurmançî ye lê di rastiyê de ew fehrest e û gelekî kurtir e, ji ber ku ez li ser zimanê kurdî dixebitim ne yê îngilîzî. Berga sêyem neynikek e ango ya ku di her du cildên din de heye wekî neynika wan peyvan e. Ew mirovî vedigerîne her du cildên pêşî. Ez hewl didim bo hemû peyvan rastnivîsa wan a bi latînî û bi erebî li ber hev deynim û eger navdêr be zayenda wê gotinê ka nêr e an mê ye û teşeyên tewangê û izafeyê. Wek mînak: Şivan (nêr) şivanê me; şivên, vî şivanî. Hemû ew teşeyên peyva şivan an şivanî tê de hene. Piştî hingê çend hevokên nimûneyî yê bikaranîna wê peyvê û heke hevwatera wê hebe ez wan jî berdest dikim û piştî hingê etîmolojî ango dîroka peyvê eger peyveke kevnar a zimanên îrani be ez beramberî wê ya farisî û ya avestayî û reha wê ya hindî-ewropî didim û eger bi soranî, zazakî û kelhorî hebin ez wan tevan dixim navê. Eger gelek şikil û teşeyên wê peyvê hebin mirov dikare li gor wan hemû teşeyan li peyvê bigere. Wek mînak pîvaz heye li hin deveran dibêjin pîvaz mirov

dikare li gorî pîvazê jî li gotinê bigere lê dîsa jî ew gotin dê te vegêrine ser pîvazê. Birûsk Dogan hevlekî min bû. Ew ne tenê heval lê destbirayê min bû ku berî 2-3 salan çû ber dilovaniya xwedê. Ew hîna gelekî cihêl bû, ew 47 salî bû. Min xwest ku bîranîna ebedî ya wî destbirakê xwe bikim û wiha min biryar da ku navê wî li ferhengê bikim û wiha navê ferhenga min bû ferhenga Birûskî.

Wekî zimannasekî gelo dê bersiva we çi be ji bo kesên ku dibêjin zimanê kurdî gelekî qels e û jî çend gotinan pêk tê û rista zimanê kurdî di nav zimanên Rojhilata Navîn de çi ye?

Di rastiyê de ez dudil im gelo tiştên wiha bêmane divê em bersiva wan bidin an jî em gotinên wan bavêjin piştî guhê xwe. Bêguman zimanê kurdî zimanekî gelekî dewlemend e. Çapa yekem a ferhenga min zêdetir ji 890 rûpelan pêk hat. Ya duyem jî sê bergan pêk tê. Ne hewce ye ku em wan îqna bikin ew naxwazim bawer bikin ku zimanê kurdî zimanekî rasteqîne ye. Kêfa wan e lê di rastiyê de zimanê kurdî eger em zimanê hindî-ewropî wekî darekî bifikirin gelek şaxên wê hebin zimanê hindî-arî şaxeke ji wê darê ye; farisî, kurdî, zazakî û goranî ew jî zimanên kurdistanî ne û zimanê sanskrîtî û zimanên (keç) yê ku jê hatine wek ordu, hindî, nepalî, huncabî û maratî, koçeratî û hinek


din jî hene. Lê ez çima dibêjim kurdî û zazakî ji hev cuda ne ji ber ku bi min kurmançî dibe soranî ango gava mirov ber bi başûr û ber bi rojhilat ve diçe kurmançî dibe soranî. Li Akirê, li Behdînanê wek dibêjin li başûrê Kurdistanê gava mirov ji wir derbasî herêma soranî dibe Rawandûz tixûbê di navbera soranî û kurmançî de ye. Her wiha soranî ku kurdiya naverastî ye li Mukreyan û Hewlêrê heye û Senendec piştî wê mirov derbasî tixûbê kelhorî dibe (Kirmanşan, Dînawer û wan deveran) yanî hêdî hêdî kurmançî dibe soranî û hêdî hêdî soranî dibe kelhorî.

Gelek kurd hene bi kurdî nizanin û dibêjin em edî nema dikarin kurdî hîn bibin, gelo hînbûna zimanekî ewqasî zor e, tu ji bo wan kesên çî dibêjî û di hebûn û domdariya cîvakan de rista ziman çi ye?

Rast e ji dewletê mirov nikare bixwaze ku destûrê bide perwerdeya bi kurdî, ez qebûl nakim lê mirov nikare wan ji cî bilivîne an jî wê yekê ferz bike. Lê çareserîya min ji bo wê yekê ev e; bi riya radyo, televizyon û internetê mirov dikare kursên rojane bo zarokên kurdan çêbike. Lê di rastiyê de di pêş de divê em qadroyek mamosteyan perwerde bikin ku sistemeke standart bê afirandin û ku hemî mamoste li gor wê bîr perwerdekirin. Bi qasî ez dizanim gavên wiha li Rojava hatin avêtin divê em wan wekî bingeh bi kar binin û berfireh bikin. Bi dîtina min jî bo perwerdekirina zarokên kurdan divê ku zarok bi her du zaravayan kurmançî û soranî perwerdeyê bibînin.

Her sal gelek ziman wenda dibin û di vê demê de ku metirsiyek ji bo kurdî jî heye, gelo li gorî te li bakur divê kurd zimanê xwe çawa biparêzin?

Bersiva min bo vê pirsê gelekî sade ye. Divê hemû dayik û bavên kurd bi zarokên xwe re tenê bi kurdî bipeyvin. Li derve dikarin bi zimanekî din bipeyvin lê mirov dikarin biryar bidin ku di nav mala xwe de tenê bi kurdî biaxivin û mirov ji zarokên xwe re bêje heke tu bi zimanekî din bi min re biaxivî ez bersiv nadim te. Mirov dikare sistema bavêtiyê jî bo tiştên baş jî bi kar bîne. Gotina bavê min wisa ye û ez newêrim jê derkevim û divê ez bêdîlya wî nekim. Divê mirov bi zarokên xwe kurdî bide xwendin û stranên xwe bide guhdarkirin û hezkirina xwe bo zimanê xwe û çanda xwe wergerîne ser zarokên xwe ango ser nişên nû. Heke kurd wiha nekin dibe ku zimanê kurdî piştî 20-30 salên din jî holê rabe. Hinek kes jî dibêjin kurd zehf in û metirsiyek wiha tune ye heke ez wisa nekim jî wê gelek kesên din wisa bikin ev yek şaş e. Divê her yek jî alî xwe ve wisa bike û li hêviya kesekî/e din nemîne. Heke her yek li benda kesekî/e din bimîne dê zimanê kurdî jî holê rabe û ew yek dê gunehe kurdan bi xwe be ne gunehe dewletên desthilatdar be.



Mertal
Selîm Temo

Kurdayetî di Helbesta Melayê Cizîrî de

Gava zarok bûm, qesîdebêj û xezelxwan dibûn mêvanê me û jê helbest dixwendin. Min digot qey ew helbest ayet in. Ji kana Kurdî werdibûn. Îca feqê û alimên civatê bi cizba diketin, hin kes soba sor didan ber dilê xwe, hin ji wan serê xwe li dîwaran dixistin.

Helbestên Melayê Cizîrî kirin ku jiyana sor bidim ber dilê xwe û serê xwe li dîwarê hicrika seydayî bixim heya bibe xirxirk!

Her dibêjim, “Wêje ji cihanê mezintir e, Melayê Cizîrî ji jî wêjeyê mezintir e!” Gava nêzikî Dîwanê dibî, oqyanûsek diçelqile.

Te dît subhetek helbestî ya Cizîrî û Feqîyê Teyran heye. Di hin metnên Bakurî de dibêjinê “danberhev” an jî “munazarat.” Arîf Zêrevan ku çapeka rind a Dîwana Melê amade kiriye dibêje “hevdubej.” 50 sal berê Abdulre-qîb Yûsuf di Dîwana Kurmancî da gotiye “berekan.”

Mela û Feqî bîyî dilê hev bi-hêlin û gotinên xwe li hev siwar bikin, olaneka hevpar tînin zimên. Ber bi dawîya berekanê ve pesnê hev didin. Feqî dibêje: “Dî zum-reya mîhrdaran / Tu roj î, ez hê tav im.” Mela dibêje: “Senexwanê Feqeh im / Evroke li Cizîrê.”

Ez jî dibêjim: “Ger siya Melayî hebit / Me bi rozê çî hacet?”

Em dikarin hemû wêjeya Kurdî ya piştî Cizîrî, wek siya Melê bibînin. Kesek nîne di helbesta Kurdî de ku silavek nedabê.

Heke em siya wî bin û yekî weke wî ji Cizîrê rabûbe, divê em behsa du xalên girîng bikin: 1) Cizîra Botan bajarekî ewqas pêşketî bû ku helbestkarekî ewqas mezin wêlidand. 2) Divê beriya Melê û di serdema wî da bi dehan helbestkarên mezin rabûbin ku rojek wisa ji nav wan hil bibe.

Heke em siya Melê bin, naxwe helbestkêr hem bo roja xwe gotiye hem bo roja me. Divê em herdu rojan ji hev derxin. Ne çavê roja îro bo roja çûyî rastiyê dibîne, ne çavê roja çûyî roja îro dibîne.

Bo çî dibêjim? Di wêjeya klasîk de klîşe (mezmun) hene. Simbol in û wateya xwe cuda ne. Wek mînak Teter postevan e, Tirk maşûq e, Hindî xal e, nêrgîz çav e, tîr bijang e.

Heke ev peyv simbol bin û qest ji wan sewirandina eşq û maşûqê/i be, ya Mela dike dareka bilind a em li binî çî ye?

Îca werinê.

Helbesta klasîk pala xwe daye Nû-Platonîzmê ku di her warî de îdeyek heye. Wek mînak, îdeaya çiyê “Kuhê Bêsîtûn” e. Gava helbestkar behsa çiyê bike, divê navê çiyayê Bêsîtûnê hilde. Lê çiya bo Melê, Qendil e ku dibêje: “Tu narê firqetê zanî / Dikarim ez tehemmul kim / Diyarê kohê Qendil im / Meger fil im di eşqê da” (42).

Helbet bajar û welat ji simbolîk in, lê Mela Kurdistanê jî dike

simbol: “Tenha ne Kurdistan didin / Şîraz û Yeng û Wan didin / Her yek li ser çehvan didin / Ji Espehan têtin xerac” (76). Dîsa dibêje: “Bi tebilxaneyê şahî were text / Ko tu îro şehê Kurdistan î” (243).

Gava behsa Dicleyê tête kirin, dibêje: “Da binasî xeterên re tu nebî xafil-î jê / Dicle ye lê di pir in bir birê pêl û ber û merx” (88). Wek tê zanin simbola feyz û coşê di helbesta klasîk de Nîl e. Lê Mela wiha dibêje: “Feyza me şubhê Nîl e em Dicle û Ferat in” (113).

Di helbesta klasîk de tekye meyxane ye, mirîd zarokên agirperestan in, mirşîd jî pîrê Zerduştîyan e. Lê li nik Melê, Laleş dibe simbol: “Dilgeşte min ji dêrê naçim kenîştêyê qet / Mîhrabê wê

bi min ra wer da biçîne Laleş” (112).

Qraleq dixwaze bihuşte li ci-hanê çêbike li Hîcaz an jî Suriya îroyîn. Jê re dibêjin “Baxê Îrem”, yanê baxçê bihuşte. Lê binêrin Mela çî dibêje: “Gulê baxê Iremê Bohtan im / Şebçîraxê şebê Kurdistan im” (272). Ecêb e.

Mela ecêb e. Dizane çî bandora helbesta xwe heye ku dibêje: “Sed Çîn di xwe da girtiye zulfê te bi çîn / Şîra me û heq lew çû heta Maçînê” (251).

Me ti gazin tune, Kurdî daye me, em şad in li bin siya Melayî.

Çend Nîşe: 1. “Senexwan” meddah û pesndar e. 2. Mebest jî “roz”ê “roj” e ku di Dîwanê de Mela dibêje “roz.” 3. Jimara rûpelan jî çapa Hewlêrê didim: 2007, Amd. Arîf Zêrevan, Dezgey Aras.



Ger gotinên xweş dixwazî wer kurdî bixwîne

Meriv dikare bi zimanê xwe dil û mejî rehet bike. Ji bilî zimanê rastîn ê jiyana me ti ziman nikare dilê meriv rehet bike. Tenê zimanê bav û kalan dilê merivan rehet dike

Mela Mihyêdîn

Ger gotinên xweş dixwazî wer kurdî bixwîne

Te bi farisî, erebî û bi tirkî çî hacet

Ziman, zimanê bav û kalan e
Ziman dayîna Xwedê ye
Mîrasa sedsalan e

Ev zimanê qedîm û şêrîn wê heya bimîne, heta ebed

Em ê biçin û ew ê bimîne
Zarok û nevi wê biçin lê ew ê her bimîne

Zordest û zalimê biçin lê ew ê her bimîne

Her tişt bi zimanê mirovî xweş e. Şer, azadî, evîn, gotinên xweş, dijûn (sihef, xeber), laqirdî, zanîn, feza hema tu çî bêjî bi zimanê mirovî xweş e. Hemû ziman wek hev şêrîn û xweş in. Zimanek ji zimanê din ne çêtir e. Hemû ziman têra her tiştî dikin bes bila hişê me tîr be.

Meriv dikare bi zimanê xwe dil û mejî rehet bike. Ji bilî zimanê rastîn yê jiyana me ti ziman nikare

dilê meriv rehet bike. Tenê zimanê bav û kalan dilê merivan rehet dike.

Kurdî di her qada jiyana de ji xwe re hêlmên delal çêkirine. Bes bila çavên me ji delaliyê fam bike û hişê meriv ji zanînê. Wê demê meriv tamed mezin ji zimanê xwe werdigire û meriv pê serfiraz dibe. Ev jî tenê bi xwendinê dibe. Xwendin, xwendin û xwendin lê xwendina rastî. Xwendin e ya me azad dike. Xwendin e ya me dîgîne asta mirovahiya bilind.

Di destpêka misilmantîyê bi xwe de jî dema Cebrail ji ezmanan tê ba pêxember jê re emrê Xwedê yê pêşî dibêje. Ew jî “Îqra” ye angû “bixwîne” ye. Xwedê teala jî dizane ku kesê/a xwende her dem wê rastiyê bibîne û wê jî şaşîya xwe vegere û bikeve rêya rast. Lewma emrê wî yê pêşîn “Bixwîne” ye. Divê em jî bixwînin û bibin zana û tîkevin rêya rast.

Divê em bixwînin û hay ji xwe hebin, hay ji dîrokê, hay ji çîrokê û jî çanda xwe. Gava me xwend em ê li xwe xwedî derkevin û di dawîya dawîn de em ê serfiraz bibin. Lê divê hemû xwendinên me bi zimanê me bînin kirin. Ji bo ilm û zanînê divê meriv bi zimanê din jî bixwîne û wan berhemên wergerîne zimanê xwe da ku zimanê me di her qada jiyana de hêlmên nû ji xwe re çê bike. Ji bo yekê jî divê em xwe hîni zimanên nû bikin û jî wan zimanan bo zimanê xwe wergerê bikin.


Berê Xanî, Feqî, Cizîrî, Celadet û Cegerxwîn hebûn û niha jî gelek neviyên wan di rêya wan de derbas dibin. Ji bo zimanê xwe kevîr li ser kevîr dikin û dibin mîmarê dîwarê xwe. Divê meriv mil bide wan û jî bo dîwarê jî bo me hatiye lêkirin xizmetê bike. Divê meriv berhemên wan bixwîne. Hema neyê xwendin jî divê di her malekê de Mem û Zîna Xanî, Dîwana Feqîyê Teyran û Dîwana Melayê Cizîrî hebe. Çawa di her mala misilmankî de Quran hebe û neyê xwendin jî li ber çavan û di qewlikê xwe de ye. Divê berhemên Xanî, Feqî û Cizîrî jî di her maleke kurd hebin.

Divê meriv dîwarê ku wan lêkirî hilde jor wekî mîna Birca


Babilîyan dîwarê xwe bilind bike. Belkî wê çaxê Xwedê dîwarê me bibîne û belkî alîkarîyê bide me.

Emanet di xizmeta zimanê xwe de bin û jî bo zimanê xwe xizmetê bikin. Alîman rê jî me re vekiriye. De werin xwişk û birayên delal wekî ehlê rê bikevin rê. Di vê rêyê de ji can û dil bixebitin. Xebat û xwendina we wê bibe felat ji bo me lê betalî wê ji me re bibe kolefî, de werin û guh bidin van gotinên Şêx Mûşerref: “Kesê xwenda muheqqeq her emir e / Nexwenda her wekî pîvaz û sir e”.

Emanet di xizmeta zimanê xwe de bin û jî bo zimanê xwe xizmetê bikin.



Ziman û Raman



Samî Tan

Bersiveke pêwîst

Vê hefteyê ez dixwazim bersiva hinek nîrxandinên Îbrahîm Seydo Aydogani der barê rêzimanê da bidim. Ew demek e, Îbrahîm Seydo Aydogan jî wekî gelek kesan der barê Rêbera Rastnivîsînê da bîr û boçûnên xwe bi zimanekî nîvhenekî dinivîse. Di nivîseke xwe da Aydogani bi van gotinan qala min kiriye: “Babet ne sîstema deman e, lê Samî Tan behsa « dema bê ya nêzîk » kiribû ku ji Rêzîmana Joyce Blau girtibû. Joyce Blau û Veyî Barak bi hev re ew rêzîman bi fransî nivîsîne. Ya ecêb ew e ku Samî Tan bi fransî nîzane û Joyce Blau jî bi kurdî nîzane. De were û parçeyan ji canê xwe neke! « Dema bê ya nêzîk » demeke sîstema fransî ye ku canikê xwastiye weke pîne bîne kurmanciyê. Samî Tan mînaka « Ez dikim bikevim » dide, digel ku di vê bevoke de amadekariya dema bê nîne û ne weke « Ez ê bixwîm » e. Bi fransî dema bê ya nêzîk, demeke serbixwe ye û di şîna dema bê bi xwe de tê bîkaranîn ku edî nêzîkê û dîr tê de nemaye.”

Tiştê balkêştir ev e ku kekê Îbrahîm li bal xwe fantazyek çêkiriye û li ser wê rexneya xwe ava kiriye. Min ne ew pîrtûka Joyce Blau û Veyî Barak dîtîye, ne haya min jê heye. Her wekî ew dibêje, ez bi fransî nizanîm, lê belê heke kekê Îbrahîm destûrê bide, ez bi îngilîzî dizanîm, di îngilîzî da jî demeke nêzî vê demê heye ku jê re “Near Future Tense” tê gotin ku wergera wê jî dema bê ya nêzîk e.

Mînak:

This weekend I am going to shopping with my friends (Dawîya vê hefteyê ez dikim tevî hevvalên xwe kiryarîyê bikim.)

Kekê Îbrahîm, heke cenabê te destûrê bide, ez bi farisî jî dizanîm, di farisî da jî demeke nêzî vê dema kurmancî heye. Ew jî vê demê bi alîkarîya lêkera “daştên” bi dest dixin, jî vê demê ra jî dibêjin, “لاح یرارمجتسا (halê îstîmrarî) yanî dema niha ya domdar.

Mînak:

(darem mirevem) مرویمراد
Ew jî ji aliyê wateyê ve gelekî nêzî forma “ez dikim biçim” e. Her wiha di zimanê farisî da dema bê jî bi lêkera alîkar “xasten” tê bidestxistin.

Mînak:

دیدی دماخ ار دستود (düstem ra xahem did)

Îcar em werin ser mijara têkilîya xuyang (aspect) û demê. Di demê da cihê bûyerê li ser hêla demî li gorî cihê ku bêjer dipeyve tê destnîşankirin. Bo nimûne, di dema niha da bûyer di dema axaftîna bêjer da, di dema borî da bûyer berî axaftîna bêjer û di dema bê da bûyer piştî axaftîna bêjer pêk tê. Heçî xuyang e, ew der barê bastûra demî ya bûyer û rewşê da, pê ra jî der barê awayê pêkhatina wê ya di demê da agahîyan dide.

Xuyang di lêkera de qala nîşaneyên lêkerî dike, ew yên ku mawe û domdariya rûdan û qewimînê nîşan didin. Di xuyangê da qirov bala xwe dide aliyên mîna ka kar qediyaye yan jî neqediyaye; didome yan jî dubare dibe û hwd. Li gorî vê pênasekirinê mirov dikare hemû demên ji bilî her sê demên sereke yên ku li ser hêla demê tînin nîşandan, wekî xuyang bi nav bike. Her wiha wekî dem binavkirina van forman jî ne li dijî pîvanên zimannasiyê ye. Her wiha di gelek zimanan da dem û xuyang li gel hev hatine pênasekirin, sinorên her dukan wisa bi zelalî nehatine destnîşankirin.

Ji bo yekitiyê sekneke hevpar

Navenda Nûçeyan

Li her çar parçeyên Kurdistanê her çiqas geşedanên ku rojevê diguherînin derdikevin holê jî, dîsa jî ji bo kurdan yekitiyê mijara herî girîng e. Di demên borî de xebat, civîn, konferans û komxebat li Ewropa, Başûr, Bakur û Rojava hatin kirin. Van xebatan bandor li raya giştî kir ku êdî li her qada jiyane qala girîngiya yekitiyê bê kirin.

Yekitiya neteweyî rojeva sereke ya gelê kurd e. Ligel geşadanên her çar parçeyên Kurdistanê dîsa jî nîqaşên der barê yekitiya neteweyî de didomin. Jin, ciwan, pîr û kal êdî dixwazin xewn û xeyalên xwe pêk bînin û dixwazin kurd bînen cem hev. Her kurdek êdî di ferqê de ye ku wekî av û nan yekitiyê hewce ye. Li dijî êrîş, dagirkerî, politikayên bişafîtinê, nenaskirina nasnameyê û tunebûna statuyê divê êdî sekneke hevpar bê nîşandan. Rojnameger Jîno Mihemed, Dilêr Ebdulrehman, endama Desteya Tevgera Azadiyê Şehên Mihemed û çalakvanê xebatên civakî yê sivîl Saman Celal bal kişandin ser girîngiya yekitiyê.

Di nav civakê de qurbanên sereke her tim jin in û desthilatdar jî li hemberî jinan û bi taybetî jî li hem-

Li dijî parçekirin û dijminatîya kurdan êdî sekneke hevpar hewce ye û ev tişt jî bi avakirina yekitiya neteweyî ya kurdan pêkan e

ber jinên kurd politikayên taybet diafirînin. Endama Desteya Tevgera Azadiyê Şehên Mihemed jî bal kişand ser vê mijarê û got: “Li dijî politikayên desthilatdaran divê yekitiya jinan xurt bibe. Dema yekitiya jinan xurt be dê bandorê li ser yekitiya neteweya kurd jî bike. Jinên kurd her tim dikarin pêşengiya yekitiya neteweyî bikin.”

Rola jinên başûrî girîng e

Di demên dawiyê de li başûrê Kurdistanê hewldana jinan girîng e. Jin bi xebat û têkoşina xwe dixwazin di qada siyasat, aborî, tenduristî û hwd. de xwe bi rêxistin bikin û temsiliyeta jinan derxin holê. Mihemed, di axaftina xwe de destnîşan kir ku ligel hewldana jinan a temsiliyete hewldana wan jî bo yekitiya neteweyî jî girîng e û wiha dom kir: “Hêza jinên Başûr jî heye ku pêşengiya yekitiya neteweyî bikin.”

Li Başûr jin jî bo pêkanîna yekitiya kurd gelek çalakî û bername li dar xistin û her wiha tev li xebatên yekiyê jî bûn. Rojnamegera jin Jîno Mihemed jî wekî Şehên Mihemed di axaftina xwe de bal kişand ser



pêngava yekitiyê û wiha dest bi axaftina xwe kir: “Tirkiye dizane ku dema yekitiyê pêk were dê bandora xwe ya li ser kurdan wenda bike. Ji ber vê jî êrîşên xwe bi her awayî didomîne. Hêza me jinan heye ku em bibin pêşengên yekitiyê, hêzê bidin xebatên yekitiyê û li dijî êrîşan bisekinin.”

Li her çar parçeyên Kurdistanê politikayên cuda tên meşandin. Rojnamegerê başûrî Dilêr Ebdulrehman jî mijara êrîşê û yekitiyê wiha nixand: “Yekitiya neteweyî ya kurdan li dijî dagirkerî û parçekirîna gelek girîng e. Pêkanîna yekitiya neteweyî derkeke niştîmanî ye.” Ebdulrehman, di axaftina xwe de bang li rêxistin,

sazî û partiyên siyasî kir û got: “Divê rêxistin, sazî û partiyên siyasî dev ji berjewendiyên xwe yê hizbî berdin û li dijî hemû gefan jî bo pêkanîna yekitiyê bixebitin.”

Erka sereke yekitiyê

Li ser girîngiya yekitiyê jî çalakanê xebatên civakî Saman Celal jî diyar kir ku heke yekitiyê pêk neyê kurd tu carî nikarin bigihêjin armancên xwe. Celal mijar wiha nixand: “Parçebûna niha ya di nav kurdan de, ziyane dide kurdan. Dijmin jî ji parçebûnê sûd wêdigire. Ji bo vê jî erka sereke ya partiyên siyasî û rêxistin ew e ku yekitiya neteweyî pêk bînin.”



Raperîna Başûr serfirazî ye

Navenda Nûçeyan

Ji beriya 29 salan xelkê başûrê Kurdistanê li dijî zilm û dagirkeriya rejîma Baasê serî rakir û hikûmeta xwe ava kir.

Di 5'ê adara 1991'ê de xelkê başûrê Kurdistanê yekem car li Ranyayê li dijî rejîma Baasê serî rakir û piştê ev serhildan belavî tevayî bajar û navçeyên başûrê Kurdistanê bûn. Di 20'ê adarê de bi rizgarkirina Kerkûkê re raperîn bi dawî bû û rejîma Baasê jî axa başûrê Kurdistanê hat dîrxistin. Lê piştî hefteyekê di roja 28'ê adarê de rejîma Baasê careke din êrîş kir û Kerkûk dagir kir. Her wiha li dijî tevayê başûrê Kurdistanê dest bi êrîşê kir. Ev êrîş jî bû sedem ku xelkê Başûr ber bi bakur û rojhilatê Kurdistanê ve koç bike.

Di tîrmeh û cotmeha heman salê de careke din xelkê başûrê Kurdistanê bi pêşengiya Eniya Kurdistanî li Hewlêr, Silêmanî û Dihokê serî rakir û tevayê saziyên rejîma Baasê jî nav xwe derxistin. Piştî wê di 19'ê gulana 1992'yan de yekem car hîljartinê parlamentoyê li başûrê Kurdistanê hat lidarxistin û parlamento hat avakirin. Di parlamentoyê de ji 105

kursiyên 5 kursî jî bo pêkhatiyên din hat dayîn.

Bi minasebeta salvegera raperîna ya 29'ê min konseya rêvebera Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) daxuyaniyek da û diyar kir ku serhildana 1991'ê, guherîna mezin bû di dîroka Kurdistanê de. Konseya KNK'ê, destnîşan kir ku wê serhildanê, parlamento û hikûmeta herêma Kurdistanê li pey xwe anî û di dîrokê de bû destkeftiyên neteweyî û niştîmanî.

KNK'ê di daxuyaniyê de diyar kir ku xelkê Kurdistanê bi giştî jî bo van destkeftiyên şa bûn û wiha hat gotin: “Her çend ku ev ezmûn bi qonaxên pir zehmet û nakokiyên dijwar û şerê navxweyî re derbas bû jî, lê belê gelê me her wek destkefteke neteweyî û niştîmanî dibînin û diparêzin. KNK'ê di daxuyaniyê de destnîşan kir ku di salroja serhildana mezin a gelê başûrê Kurdistanê de em vî serhildanê bi şanazî dinirxînin. Daxuyaniyê wiha dewam kir: “Ji bo başûrê Kurdistanê jî hêvîxwaz in qeyrana aborî û siyasî jî holê rabe. Em careke din serhildana mezin a başûrê Kurdistanê pîroz dikin, serê xwe bo hemû giyanbextkerên xebata rewya ya gelê xwe ditewînin.”

Agirbesta Idlibê ket meriyetê

Serokdewletê Rûsyayê Vîladimir Pûtîn û serokkomarê tirk Recep Tayyip Erdogan di 5'ê adarê de li Moskowê jî bo Idlibê civiyan. Di civînê de biryara agirbestê derket û ji bo Idlibê ‘belgeyek hevpar’ jî hat ragihandin. Li gorî hevdîtinê rewşa heyî Tirkiye destvala ji civînê veqetîya. Her wiha çeteyên li vir jî naxwazin ji herêma derkevin. Agirbesta ku hatî îlan kirin baweriyê nade hemû aliyên. Gelo agirbest dê bandorek çawa li tîkiliyên di navbera rejîma Sûriyê û Rûsyayê, tîkiliya Tirkiye û Rûsyayê, her wiha Tirkiye û Amerikayê bike ne diyar e. Bi taybetî agirbest dê bandora xwe li siyaseta Tirkiyeyê jî bike.

Rûsya û rejîma Sûriyeyê di 27'ê sibatê de li Idlibê li leşkerên tirk xistin û bi dehan leşker mirin. Piştê trafika diyalogê dest pê kir. Civîna Pûtîn û Erdogan 2 saetan dom kir. Heyetên aliyên jî civînek li dar xist. Piştî civînê li ser agirbestê li hev kirin.

Beriya xwendina belgeyê, Pûtîn diyar kir ku: “Ji sersalê û vir ve faliyetên terorê yê li Idlibê zêdetir bûn. Bi awayekî fiilî milîta-

nan dest bi şer kir. Her demê di dîtina xalên hevpar de bi ser ketine û li hev kirine. Îro jî heman tişt bû. Em li gel serwerî û yekparebûna axa Sûriyeyê ne. Piştî hevdîtinê me belgeyê hevpar amade kirîye. Wezîrên karên derve yê her du welatan dê vê belgeyê aşkera bikin. Ev belge wê şer bide sekinandin û sivîlan aram bike.”

Erdogan piştî Pûtîn axivî diyar kir ku rejîmê li sivîlan daye, îdî kir ku armanca rejîmê ew e ku Tirkiyeyê bixe zorê.

Belgeya hevpar jî aliyê Wezîrê Karê Derve yê Rûsyayê Sergey Lavrov û Wezîrê Karê Derve yê Tirkiyeyê Mevlut Çavuşoğlu ve hate xwendin. Di belgeyê de van xalan cih girt: Li tevahî herêma ku alozî û şer lê hene dê hemû xebatên leşkerî di 6'ê adara 2020'ê saet 00:01'ê de bînen rawestandin. Li Bakurê rêya (M4) Heleb-Lazikiyê 6 kîlometre li başûrê wê bi kûrariya 6 kîlometre wê koridoreke ewlekariyê bê avakirin. Di nav 7 rojan de dê biryarên esas bînen zelalkirin. Wê dewriyeyên rûs û tirk 15'ê adarê li ser rêya M4 jî devera Trûmba heta Eyn El Hawarê dest pê bike.” **MOSKOW**



Serhildana 12'ê Adarê

Hozan Emîn

Piştî salên 2000'î rejîma Sedam Huseyin li Iraqê li ser destê hezên hevperman bi serokatiya Amerikayê hat hilweşandin. Di encama wê de li başûrê Kurdistanê herêmeke federal hat damezirandin û sala 2003'yan parlamento hat damezirandin. Bêguman ew ne li gorî kêf û xweşiya erebên nijadperest û rejîmên wekî Sûriyê û Tirkiye û Îranê bû. Her yek li gorî rewşa xwe li hember kurdan bi awayekî tevgeriyan. Xwestin ku ew hewa azadiyê ya ku bi ser kurdên Iraqê ve hati bandora xwe li kurdên di nav sinorên wan welatan de neke.

Di 12'ê Adara sala 2004'an de li bajarê Qamişloyê di navbera tîma Cihad a Qamişlo û tîma Fitiwê ya Dêrazorê de maça futbolê hat listin. Lê dema listikvan û gel derbasî stadymê bûn, komên nijadperest ku ji berê de ji aliyê rejîma Baas ve hatibûn erkdar kirin, dirûmên li dijî gelê kurd ‘Hilweşin rêberên kurdan û bîji Sedam Hisên’ berz kirin. Li gel dirûman jî bi keviran êrîşî kurdan kirin. Polis û leşkerên rejîmê hemwext êrîş pêk anin û hemû deriyên stadymê girtin.

Endamên rejîma Sûriyeyê dest bi êrîşa li ser cemareriya Qamişloyê kirin. Divê aligirên tîma Fitiweyê di beşa mêvanan de cih bigirin, lê rejîma Sûriyeyê bi zanebûn ew tev li aligirên tîma Cihadê kirin.

Dema aligirên tîma Fitiweyê û Cihadê bi hev ketin, hêzên rejîmê bi fermana parêzgerê Heskê Selîm Kebûl, yekser mudexele kirin û bê ser û bergule li beşa aligirên klûba Cihadê reşandin. Ev tişt di dîmenên ku dezgehên çapemeniyê di wê demê de belav kiribûn diyar bû. Di encamê de 9 kesên ku di nav de 2 zarok jî hebûn jiyana xwe ji dest da. Piştî ku agahî belav bû, bi sedan ciwanên kurd berê xwe dan stadê, tevî ku hêzên rejîmê nehiştin derbasî stadê bibin, ji ser diwaran derbas bûn û piştigirî dan birayê xwe yê di nav stadymê de û bi vî awayî pevçûnan rû da. Berpîrsê parêzgera Heskê di wê demê de Selîm Kebûl bû, ferman da ku gule li kurdan bîreşînin, ji ber vê yekê hejmarek sivîlên kurd şehîd û birîndar bûn.

Piştî van êrîşan gelê kurd li rojavayê Kurdistanê û hemû bajarên Sûriyeyê yê ku kurd lê dijîn daketin kolanan û nerazibûna xwe li dijî rejîma Baasê anîn ziman.

Fêkiyê wê şoreşê

Di sala 2011'an de bi destpêka bûyerên li Sûriyeyê yê di bin bandora ‘Bihara Erebi’ de, gelê kurd beriya her kesê amade bû ku tev li serhildanê bibe. Amerên xwe jî rejîmê paqij kirin û li dijî komên çete û tundiparêz berxwedaneke bêhempa dan meşandin. Bêguman destkeftiyên ku niha li rojavayê Kurdistanê hatine bidestxistin ji mirov dikare wan wekî fêkiyên wê serhildana gel bi nav bike.

Xuya dibe ku îro kurdên rojavayê Kurdistanê piştî 16 salan jî wê serhildanê xwedî vî û xweseriyêke taybet in. 16 sal di ser serhildana Qamişloyê re derbas bûn û navê Stada 12'ê Adarê ya ku rejîma Sûriyeyê hewl dida ew biguherîne stada fitneyan, xistin û windakirina kurdan. Lê belê niha bi hewldana rêveberiya xweser stad bû cihê hemû pêkhatiyên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê.

Di navbera sînoran de asê man!

Penaber û koçber li dijî şer, pevçûn û xizaniyê derketin rêwitiyeke nediyar. Rêwitiya penaberan her tim bû amûra siyaseta welatan. Niha jî bi hezaran penaber di navbera du sînoran de asê mane

Navenda Nûçeyan

Li Tirkîyeyê 5 milyon 678 hezar û 800 penaber û koçber dijîn. Piştî leşkerên tirk li Idlibê mirin rayedarên Tirkîyeyê daxuyani dan û gotin deriyê sînor hatine vekirin û penaber dikarin biçin. Piştî daxuyaniyê bi dehhezaran penaberan berê xwe dan deriyê sînor. Rewşa penaberan niha di rojêva cîhanê de ye.

Her penaberek bi xeyaleke cuda bi rê dikeve û mirinê dide ber çavên xwe. Lê di her rêwitiyê de xeyal pêk nayên. Ji ber ku di her qonaxa ku xwe digihînin de êdî xeyal têk diçin û tenê fikara mayîna li jiyana dimîne. Şer, pevçûn û xizani sedemên sereke ne ku penaber welatên xwe dîtînin. Êdî li welatê xwe li benda mirinê nasekinin û ber bi mirinê ve bi rê dikevin.

Sala 2019'an Organîsazyona Karên Cîvaki û Aborî ya Neteweyên Yekbûyî der barê penaber û koçberan de raporek aşkera kiribû. Li gor raporê li cîhanê 272 milyon penaber û koçber hene. Di raporê de tê gotin ku li Tirkîyeyê her ku diçe hejmara penaber û koçberan zêdetir dibe. Li gor rapora 2019'an 5 milyon 678 hezar û 800 penaber û koçber li Tirkîyeyê dijîn. Lê belê sala 1990'î ev hejmar milyon û 163 hezar û 700 bû. Sal bi sal hejmar zêdetir bûye.

Wargeha koçberan...

Welatê ku herî zêde dibe wargeha koçber û penaberan jî bakurê Kurdistan û Tirkîyeyê ye. Lê rawestgeha yekem jî bajarê Wanê ye. Her koçber û penaberek çirokek wê/î heye. Penaber û koçber li cihê ku dimînin bi êrişa zayend, nijad, ol û neteweyî re rûbirû dimînin. Lê belê li vir polîtîkayên dewletan jî hêzê didin van êrişan. Çend mafên penaber û koçberan bi qanûn û pîymanên navneteweyî hatibin teqezkirin jî ev qanûn pêk nayên.



Nikarin mafê xwe biparêzin

Mafê her penaber û koçberî/ê heye ku ji mafê perwerde, tenduristî, civakî û kar sîvîl werbigire. Lê ev tişt wekî ku tê gotin nabe. Bi taybetî bînpêkerina mafan herî zêde di qada kar de pêk tê û bi heqdesteke kêr di nav şert û mercên herî nebaş de dixebitîn. Nikarin mafên xwe biparêzin. Di çiroka penaberî û koçberiyê de rewşa zarok û jinan bêtir xirab e. Zarok ji ax, ziman, çanda xwe û mafê xwe yê perwerdeyê dîr mezin dibin û dibin biyaniyên biyaniyan. Lê herî zêde jin ji destpêka rêwitiya xwe heta dawiyê bêhêvî ne. Ji ber ku kiryarên herî dijwar li hemberî jinan tên kirin.

Ji ber vê sedemê Tirkîyê ji bo Ewropayê li cihêkî kritik e. Di navbera dewletan de lihevkerîneke polîtîk heye û berjewendiyên dewletan bêtir li pêş in. Li vir jî penaber wekî amûrê siyasî tê bîkaranîn. Piştî ku li Idlibê leşkerên tirk mirin, şantaja penaberan ku Tirkîyeyê her tim li hember Ewropayê bi kar dianî, vê carê kir meriyetê.

Tirkîyê, ji bo çûyîna penaberan a Ewropayê deriyên sînor vekirin û astengiyên li pêşî derbasbûna penaberan jî holê rakirin. Bi dehhezaran penaber jî otogara Esenler

a Stenbolê û li gelek cihên din ên Stenbolê kom bûn. Fîrmayên otobusan ji 5 deqîqeyan carekê otobus tije kirin û penaber şandin Edîrneyê. Ev rewş bi dimenên medyaya civakî belav bû her derê cîhanê. Tiştên ku berê bi dizî dihatin kirin, êdî bi aşkera hatin kirin û qad ji bazirganên mirovan re vebûn. Hiqûq, maf, jiyana û mirovahî li vir têkçûyîna xwe bi zelalî raxist ber çavan.

Trajediya penaberan

Bi dehhezaran penaber dîsa li pey xeyalên Ewropayê çûn deriyê sînorê Kapîkûleyê yê Edîrneyê. Penaberên ku ji aliyê Yewnanistanê ve destûr nayê dayîn derbas bibin, bi muameleyên nebaş û êrişan re rûbirû man. Penaber di navbera her du sînoran de asê man. Dimenên çûyîna penaberan û dimenên penaberên li Edîrneyê sekinîna trajediyek nîşan da.

Wezîrê Karên Navxweyî yê Tirkîyeyê Suleyman Soyly, diyar kir ku Tirkîyê astengiyên li hemberî penaberan jî holê rakirine û penaberên ku dixwazin biçin Ewropayê dikarin biçin. Li gor Soyly heta niha 136 hezar û 776 penaber jî Tirkîyeyê çûne welatên Ewropayê.

Serokwezîrê Yewnanistanê Kyriakos Miçotakis, jî diyar kir ku penaberên piştî vekirina deriyê Tirkîyeyê bi rêyên "qaçax" derbasî welatê wan bûne de paşde vegeztin.

Her wiha Wezîrê Karên Hundir ên 27 welatên Yekîtiya Ewropayê li civîneke lezgîn deklarasyonê hevpar weşand. Di daxuyaniyê de hat destnîşankirin ku Yekîtiya Ewropayê, zexta koçberan a Tirkîyeyê ku bi armanca siyasî tê kirin bi tundî red dike. 27 welatan her wiha bang li Tirkîyeyê kir ku xalên peymanên di sala 2016'an de li ser krîza penaberan hat amadekirin bi cih bîne. Ewropîyan piştigirîya xwe ya ji bo Yewnanistanê dubare kir.

Berjewendiyên xwe diparêzin

Welatên Ewropayê der barê mijarê de daxuyani da lê belê tu welatan behsa trajediya ku li ser sînor tê jiyîn nekir. Her welat xwe difikire û naxwaze xwedîtîyê li koçber û penaberan bike. Di şîrove û daxuyaniyan de derdikeve holê ku mijar ne rewş û trajediya penaberan lê li ser parastina berjewendiyên welatan e. Ev mijar xuya dibe ku demek dirêj di rojê de bimîne.

'Divê kurd bibin piyê sêyemîn ê meseyê'

Di 27'ê sibata 2020'an de li Girava Îmraliyê ku Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan lê girtî ye agir bi daristanê ketibû. Walîtiya Bûrsayê têkildarî şewatê daxuyani da û angaşt kir ku şewat ji ber çirûskên têlên ceryanê derketiye. Piştî agahiyan parêzer û malbat jî bo hevdîtîne bikin serî li Serdozgeriya Bûrsayê da. Ji ber bertek, çalakî û daxuyaniyan 2'yê adarê malbat çûn Îmraliyê û hevdîtîna kirin.

Piştî 8 mehan malbatên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan, Omer Hayrî Konar û Veysel Aktaş çûn Îmraliyê hevdîtîna pêk anîn. Ji ber ku serdêrê/a Hamilî Yildirim nexweş bû, nekarî hevdîtîne bike. Mehmet Ocalan bi birayê xwe Abdullah Ocalan re hevdîtîna kir.

Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan di hevdîtîna bi Mehmet Ocalan re wiha got: "Ez bawer im HDP'ê kongreya xwe li dar xist. Ger li herêma hûn nebin hêz, binêrin li Tirkîyeyê meseyêke dupê heye. Di nav tevgera we de tevgerên çepgir jî hene. Bi giranî jî kurd hene. Gelên din jî hene. Divê hûn jî bibin piyek. Hûn ê li wê bibin hêz. Ger ku meseyêke sêpê be nakeve. Meseya dupê pergala çîqaş ji bo neketina wê hewl bide jî wê bikeve. Ji ber wê hewldana me ew e ku kurd bibin piyê sêyemîn. Ji bo bibin piyê sêyemîn mezinbûn divê. Her tişt bi têkoşîne, bi têkoşîna rast dibe."

Ocalan, di hevdîtîne de careke din li ser rêbaza çareseriyê sekinî û wiha axivî: "Hûn neçar in bibin hêz ku hûn dikarin van pirsgerîkan çareser bikin. Rojhilata Navîn û em nav lê bikin pirsgerîka kurd bi vî rengî dikarin çareser bikin. Heke tu nebî hêz dê kes pirsgerîkê çareser neke. Em dibêjin mese, mese dupê ye. Hûn neçar in bibin piyê sêyemîn ê meseyê. Ev bi çi dibe? Bi hêzê dibe. Heke wêya bikin dê bibe. Heke hûn ked bidin dê bibe. Belê mese pêwîst e. Ev jî dê bi ked û xizmetê jî bo gel bibe."

Abdullah Ocalan di hevdîtîne de mijara Rojava û Sûriyeyê jî nixand: "Li Rojava gelek eşîrên ereb hene. Kesên li Rojava ked didin gelek bi nix in. Ji ber xebata wan ez wan pîroz dikim. Xebateke pîroz dimeşînin. Serkeftîne jî wan re dixwazim. Tirkîyê geh bi Amerîkayê geh jî bi Rûsîyayê re ye. Ev ne çareserî ye. Çareserî ev e; divê hêzên li Rojava, di nav yekparebûna Sûriyeyê de bi awayekî hîn berfirehtir bibin hêz. Ev jî bo parastina yekparebûna Sûriyeyê pêwîst e. Rexistîbûna li Rojava ji bo yekparebûna Sûriyeyê ye. Rêxistîbûnên li wir; kurd ereb, ermen û xiristîyan heke nebin hêz dê sibê nikarin yekparebûna Sûriyeyê jî pêk bînin. Stratejiya li Rojava gelek rast e, silav û rêzên min bêyî cudatî bigihînin hemû kesên ku li wir dixebitî û ked didin." **STENBOL**



Jin ji neçariyê kolberiyê dikin

Li Îranê jî ber zêdebûna bêkarî û krîza aborî her diçe hejmara xizanan zêde dibe û ji ber vê jî rojhilatî ji bo debara xwe bikin kolberiyê dikin. Ji 15 salî heta 50 salîyan welatî jî ber aboriya nebaş kolberiyê dikin û berê xwe didin sînoran.

Gelek kolber jî ber şert û mercên nebaş di rêwitiyê de jiyana xwe jî dest didin an jî bi êrişa leşkerên Îranê ve rûbirû dimînin. Bi taybetî jî di demsala zivistanê de kolber zehmetiyên dijîn û bi mirinê re rûbirû dimînin. Di sermaye zivistanê de diqerimin an jî jî ber bagerê dixeniqin.

Her wiha her ku diçe hejmara kolberên jin jî zêde dibe. Jin jî bo debara malê bikin û ji neçariyê kolberiyê dikin. Jin bêtir bi zor û zehmetiyên

rûbirû dimînin. Zîhniyeta serdest a mîr, polîtîkayên rejîmê û nêzîkatiya civakê bêtir li ser jinê bi bandor e. Li Îranê karê ku jin bikin bi sînor in, lê bi taybetî jî polîtîkayên rejîmê yê li hember Rojhilat jî cuda tên meşandin.

Li dijî jinan polîtîkayên taybet

Endama kordînasyona Komelgeha Jinên Azad a Rojhilatê Kurdistanê (KJAR) Peyman Viyan destnîşan kir ku li Îranê li hember jinan û bi taybetî jî li hember jinên kurd polîtîkayêke taybet tê meşandin. Viyan, diyar kir ku ji ber polîtîkayên jin neçar dibin ku kolberiyê bikin û got: "Ji ber polîtîkayên niha hejmara kolberên jin zêde bûye. Jin jî 15 salîyan heya 50 salîyan kolberiyê dikin. Ev polîtîka-

yeke birçîhiştîne ye. Bi vî polîtîkayê nahêlin ku civak tişteke din bifikire. Divê li hember vî siyasîyê li Rojhilat guherînek pêk were. Divê jî bilî kolberiyê rêyek din a aboriyê bê dîtî. Ji bilî dewletê jin dikarin bi hev re projeyên aboriyê biafirînin."

Rêxistîbûn girîng e

Her wiha rojnameger Şehal Mihe-med jî destnîşan kir ku jin qurbanên sereke ne û li Îranê derfet pir kêr in û wiha axivî: "Hem jî hêla pergala dewletê ve û hem jî ji hêla civakê ve jin tune tên hesibandin. Ev jiyana jinan zehmetir dibe. Rejîma Îranê 40 sal in li hember Rojhilat polîtîkayên taybet pêk tîne. Divê jin û ciwan li dijî kiryarên rejîmê xwe bi rêxistin bikin." **URMIYE**

8'ê Adarê

Pîroz Be

Em hemû jinan silav dikin ku li her dera cîhanê li hemberî zordestî û newekheviyên şert û mercên jiyane, li hemberî ferq û meylê û tundiyê li ber xwe didin.

Roja Jinên Kedkar a Cîhanê pîroz dikin



Hevşaredarên
Xalfeliyê û Endamên
Meclisê

8'ê Adarê

Pîroz Be

Di dilê me de agirê Semayan,
Di ruhê me de lêgerîna Sarayan,
Di destê me de meşaleya Nûdem
û Sêvêyan; em têkoşînê birêxistin
dikin û ber bi azadiyê ve dimeşin...

Bijî 8'ê Adarê



Tevgera Jinên Azad (TJA)

8'ê Adarê

Pîroz Be

Bi hêviya rojên xweş, azad, wekhev û aştiyeke bi rûmet û bi dirûşma jin jiyane azadî em Roja Jinên Kedkar a Cîhanê li hemû jinan pîroz dikin. Bi taybetî em cejna ew jinên fedakar û serhildêr ên li dijî zilm û zorê, li dijî zordestiyê, li dijî bêdadweriyê têdikoşin, pîroz dikin.



Hevşaredarên
Farqînê û Endamên
Meclisê

8'ê Adarê

Pîroz Be

Em 8'ê Adarê Roja Jinên Kedkar a Cîhanê li hemû jinên cîhanê yên ku li dijî zilm û zordariyê têdikoşin pîroz dikin. Bi hêviya rojên xweş û azad, bi hêviya pêkanîna aştiyeke bi rûmet û wekhev, em vê rojê li jinên karker û kedkar pîroz dikin û di hemû kar û barên wan de serkeftinê dixwazin.



Hevşaredarên
Erxeniyê û Endamên
Meclisê

Wûsar û Çemê Dicle

Meral Ozel

Wûsar kî vat, xoza yene ra xo ser, deyr û dur yeno ra ziwan. Dar û berr beno gewe. Koyî û deştî benê reng bi reng. Boya gul û sosînan her ca cene ra xo ver. Koyan ra ver bi cer laşer kuno dereyan. Vengê qûrûrikan dewan de beno sanika hewnî. Awa dereyan xo resnena çeman, çem herekîne benê namê bereketî.

Demserî çaraxînî, wûsara piya to zonena ke serra de neweyî dest pêkerda. Hama no wûsar, serva Heskîf, serva Dola Botan, serva çemê Dicle wûsare de bîno. Dewî ke par guçike çemê Dicle de wûsar verwazî kerdî, na wûsar binê awe de mendî. Mordemî ke guçike çemê Dicle de, sew bi sew gos dayî ser sanika hazar serran, nika mûrozîni. Veng û bereketo ke Dicle axme kerdene, na wûsar jê viren niyo. Tarixî bi hazaran serran. Waxto ke game erzena zerrê na hardî, her ca ra jû sanike yena ra ro. Meymananê xo silayena sanika bi hazaran serran, demê ganî kena. Her jû hetî ra jû sanika de bîni yena ra ziwan. Qehramanî na sanike zafî.

Sanika hazaran serran
Hetê de Heskîf, hetê de



Demserî çaraxînî, wûsara piya to zonena ke serra de neweyî dest pêkerda. Dewî ke par guçike çemê Dicle de wûsar verwazî kerdî, na wûsar binê awe de mendî

çemê Dicle, hetê de Dola Botan. Waxto ke vejîna jû pûlî ser, xoza to rê yena ra ziwan. Dicle bi vengê xo ya klaman vana. Asmen jê dûwaxê dola Botan vira rê keno. Şarîstaniyî ganî yenê ra xo ser. Xo, jû reyî de zerrê şarîstaniya ganî de vîna. Jû sanika ke ziwan ra ziwan barî biya endî biyê tarix. Dicle û Firat, sanika hazaran serran, esqê hazaran serran, nika bi bendawana virmiya ci ceriya. Rindekiya xo kerdî vîndî.

Serva rantê xo kar ardene

Bendawî tarix de tim serva ca ardene îxtiyacê awe ame virastene ya kî serva awe dayena hegayan. Însônî virmiya awe guretena bendawe qışkekî îna kerdî. Qeyta xoza rê zerar nêdayî. Hama ewro însônî awa ke namê ciwûyayîşa serva rantê xo anê kar ardene. Her ke virmiya awe gureti, jû tarixa piya xoza û ciwûyayîşê însonan kî kerdî xan û xirave. Awa ke însônî guçike ci de tim ciwûyayîş îna kerdî, nika na ciwûyayîş xirave kerdene ser yena kar ardene.

Medan ra heta Persan...

Heskîf, honde pûk û pûkele ke raverna, heta roza ewroyîni pay ra mend. Mîlat ra avê û dime ra

Medan ra heta Persan, heta Asûran xeylê şarîstaniye rê wayiriye kerdo. Raya de muhîm sero ca gureto. Tim cayê xo yê muhîm est bî. Hama endî verê çimanê her kesî de bî xan û xirave. Eskêti ke bi hazaran însônî tey ca biyî, na şarîstaniyî kerdî bi reng bi reng. Coka namê Dicle biyo namê bereketî. Na seate ra tepiya xeleşiyayîş beno nêbo nêzoneme. Çiyo ke zoneme zaf zerrare de pil dî na hereme.

Dîna de virastena bendawan

Gorê tayî zonayisan yeno vatenê ke, dîna de sifte virene bendawe demê Veriya Saziyan de guçikê çemê Nil de virajiyê. Na bendawa ra awa simitene û awa dayene gureti. Guçikê Nil ra dima hetê Çin de bendawe Tû-Kiang virajiyê. Hetê Hîndîstan de kî bendawê di hazar serran hona kî estî. Hetê pûlanê Wan de gola Tûrna kî demê Êrtartûyan de kemeran ra ardiyo ca. Dîna de virastena bendawan honde gana. Hama şarîstaniyî virene xoza rê honde zerar nêdayî, bi bendawana reng û gonî dayî ciwûyayîşî. Hama nika bendawî ya kî virmiya awan guretena yena namê merdene, yena namê talan, yena namê xan û xirave kerdene,


en jede kî yena namê vûrnayîşê demografîya. Kewt ke çem estî, ûcayan de şarîstaniya ganî ama ronayene, jû tarix mîras amo roza ewroyîne. Coka ke hukumdarî çim kenê nî cayan. Coka ewro Heskîf û dola Botan, bi na tarixa piya binê awe de rê.

Gûl û sosîni benê vîndî

Bendawe herekiyayîşê awe vûrnenî. Tebiat û hawa vûrîna. Tayî deyr û dur, gûl û sosîni ke gorê tayî heremanî, bi bendawana piya benê vîndî, kokê xo yeno. En jede kî zerar danê çimanê awa pakî. Awa binê hardî, rûare nî bendan ra bena vîndî. Hegayî bereketê xo kenê vîndî. Coka na wûsar endî jê wûsaranî bîni niyo. Iyê ke raver şiyê Heskîf, na seate ra tepiya besenêkê jê viren tarix rê şahîdene bikerî. Waxto ke însônî destê xo xoza ra, tarix ra ontî, o waxt ciwûyayîş kî gorê xo beno.

Demê virenî de mordemî kewt ke jû çem esto ya kî jû ca dolanê çemî rê beno ra ûcayan de ciwûye. Bi bendawana pêro no mîrasê tarixî ke binê awan de maneno. Werte honde biyayîşê de jû tarix kî Çewlig Solxan de bî talan. No kî naca de vîndero.

Dewey Ma



Cemil Oguz

cemilo@diyarname.com

Quwet

Wexto joy qeybî joy bîni di karêke de serkewtin biwaştê vatîşê cê ana bî:

- Homa quwet bido to...

Quwet muhîm o. Quwetê to çinêbo ti nêşkenê game berzê, nêşkenê çike bigirê we. Nêşkenê sere berzkerê.

Quwet verî heme çî bi aqil beno. Aqil ferman dano dest û lîngan, dima ra reyrayîş dest pa keno, dima ra jiyane belêna, serkewtin xo mocneno ra.

Aqil çinêbo ti nêşkenê bibê wayîrê quwetî. Ha, wexto aqil virazîya û tu bî wayîrê quwetî a çaxî heme çî tamam o.

Her dewe/bajar/civatî de yê wayîrê quwetî bi qedr û çîmet bî. Şarî hurmet dayne înan. Ê girotêne serê serey xo. La ê feqîrî? Mecbûrî nêbayne joy silam jî nêdayne feqîran.

Edalet

Edalet vatîşêke muhîm o û dinya de qeybî her kesî lazîm o. La yê ke quwetê cê bibê edaletî virazenê. Ê wayîrê quwetî gorey xo ra şîkil danê edaletî. Zehfê reyan, belkî her game çîyo ke terazî edaletî virazeno, çîyo terazî edaletî keno rast e, yan jî keno çewte quwet bî xo wo. Quwetê to bibo edalet destê to de wo, quwetê to çinêbo qeybî edaletî jî ti benê parsek. Jo edaleto rastîn nêdane merdimanê ziyîfan.

Dîrok

Heta eyro dîroke, yanê tarîxe hetê merdiman, desthilatdaran, hikumet û artêşan ra hamîya niştîşî. Kam bi quwet biyo yînan tarix niştî û gorey xo ra nîsto. Çirê ma kurdan hema jî tarîxey xo nênistî, henîyan bînan nîsto? Çimkî ma bi quwetî nêbî. Erê ma bibî, la tenî bibî, weko bî çike nêbî. Loma ke quwet jî çinêbî, loma tarîxey ma zî zelal niyo.


Tewirê quwetan

Quwetî zî tewir bi tewirîye: Quwetê aborî, yê petrolî, yê artêşan, quwetê edaletî, quwetê teknoloji, yê weçinayîşî... Û quwetî tewr muhîm zî quwetê jobîyîne wo. A, etîya de mesele qedêna: Jobîyîne. Jobîyîney to çinêbo ti nêşkenê bibê quwet û nê zî bi ser bikoy.

Vatîşê verînan

Verînan bi kurmancî vato "Zêr zane, zor zane serê tîfînga mor zane". Quwet serê ê tîfîngidebiyo heta eyro. La di se serey 21'yînan de quwet hendî tenî serê tîfîngî de niyo, cureyê bîni, tewir tewirê quwetî estê. Gere heme ca ra quwetê to bibo, yan nê fêde nêdano.

Quwetê to bes nêbo ti nêşkenê bibê çike. Quwetê kurdan bes nêbo kurdî nêşkenê bibê çike. Loma 'çalê quwetî' enka reyna hamey weydan. De eyro ra pey kurdî go çîya, çîqa û bi çî awayî bibê wayîrê quwetî? Go bibê wayîrê quwetî yan go quwet ra bikoy? Ma heme têdir go bîvinê.




De qîsey bikerê...

Kamo

Kesê ke derheqê Kirmanckî de wayîrê qelemeyê û yan zî kesê ke hewes kenê ke no derheq de avê şorê, hema hema her roje cumleyanê winasîyan anê rê ziwan: "ma kenîme ke ziwan avê şoro, la kes goşdarîya ma nêkeno", "ziwanê ma nezîlê rîyî ver der o", usb, usb... Ez handê sivik û handê nerm nêvana, nuştêyê xo yê verênî yê Xwebûnî de ez raşte raşt vana: "ehey o îsoto tuj bibo adir û kile, bigino bi şalwananê şima ra û sey lojine dû ê pancikanê şima yê tengan ra wedarîyo Sêwregîjî, Curnê Reşî. Ehêy banê şima yê welîni ser o qet vevre nêhelîyo û şima her tim- her şewdir vevra serê banî bierzê Xûnisîjî, wa alûya şima bipero qirika şima û bî vengê xo yê berbokî şima reyna nêşkiyê lawikan vajê ehêy Dêrsîmîjî, Gimgim-Gimgim, wa vayê Koyê Bîngolî ver rîyê şima tim

wina bivêşo û şima singûsiya, qerqo-qerqo tena çimê şima bibereqîyê, hela hela Çewlîg, wa egsozê otomobilanê şima bixitimîyo û motorê şima bîhne megîro... Pîran, Henî, Licê, Pasûr, Qerejdax, Erxênî, Gêl... sala şima kafeyanê 75î û vilayanê diclekenti ra û werdena cîgere ra mahrûm bîmanê. Wa tîkeyê goşt nêkewo şima dest, çemê Dicle pêro çimeyanê xo bixitimno



û çilkê awa xo nêşibê şima nêkero...

Xarpêt, Sêwaz, Bilîs, Semsûr ma ez senî zewt bida şima ra... ez şima ra se vaja nêzana ke..

Domananê xo de bi ziwanê xo qîsey nêkerdenê çî ya wina!?

Ne erd ne zî asmên naye qebûl keno...

Hela ê kesê ke twîterî ser o bi kirmanckî nusene...

La-law merdim fam nêkeno ke cîsnê çekûyanê şima çî yo... ge-ge yew çekûye nêriya ge-ge eynî çekûye bena makîye. Şima ziwan kerdo pînc verdo.

Feysbokê kamaxî de şima tewr îmanê ma berdo. Hema her roj "bu zazaca da ne demek, sîzîn bölge de buna ne denîyor", nêzana çî, nêzana çî... quzilqurt, kül, merez, jar. Ma şima qet şerm nêkenê, handê kitabî, handê ferhengî estê, ê çin bê zî ma qet derûdorê şima de kesê ke nê ziwanî zanê çin ê!?

Ewro ra dime, nê rojname û nê kûncikî de ez do bi zewtanê xo, bi vaten û lomeyanê xo şima bika bi rincan, bika bi merezdarî.

Temam şima wendiş û nûştîşî ra hes nêkenê, qet nêbo domananê xo de bi ziwanê xo qîsey bikerê. Ma no zî zehmeto şima rê! Şimayê ke nê nuştêyî wanenê, ewro ra dima ke şima domananê xo de bi Kirmanckî qîsey mekerê: wa topa Evdilmusayî bigino bi odaya şima ya mêmaman a venge/tale ra. Wa koçika pirre ya ke şima kerda berz bişikîyo û qet werd mereso qirika şima. Esteyê marê şiyayî şoro lînga şima ra û heta ke destê mi nêgino piro wa darû mevîno.

Mi ê xo vatî.

De qîsey bikê, şima ke eşkenê tirkî qîsey bikê hela.

8'ê Adarê

Pîroz Be

Bi hişmendiya ne rojek lê her roj ji bo jinan 8'ê Adarê ye ango roja têkoşîna li hember hişmendiya zilamê serdest û ketî ye, em bi vê roja dîrokî dikevin bihareke din a têkoşînê. Çawa ku bihar mizgîniya şiyarbûna jin û xwezayê ye, 8'ê Adarê jî mizgîniyê dide me ku teqez dê têkoşîna jinan encamê bide û dê teqez bibe serkeftina jin û jiyanê.

Bi hest û dilînên serkeftinê em vê rojê li hemû şêrejinên berxwedêr pîroz dikin...



**Hevşaredarên
Êlihê û Endamên
Meclisê**

Fîlm ji bo Heskîfê ne

Şaredariya Êlihê, Akademiya Sînemayê ya Rojhilata Navîn û Kolektîfa Sînema Nû hevpar di 25-29'ê adarê de Festîvala Fîlman a Yilmaz Goney a 8'emîn li dar dixin. Festîvalê de li Navenda Çand û Hunerê ya Ahmet Guneştekîna a Şaredariya Êlihê were birêvebirin. Komîteya festîvalê, navên fîlmên ku di festîvalê de werin nîşandan aşkera kir.

Komîteya Festîvalê ragihand ku 165 fîlm û 52 serlêdanên pêşkêfî hatine kirin û 4 kurtefîlm û 4 belgefîlm jî ji bo pêşkêfîna projeya fîlm a kargêhê hatine bijartin. Komîteyê da zanîn ku di çarçoveya festîvalê de, dê 13 fîlmên metrajdirêj, 17 belgefîlm û her wiha 21 kurtefîlm bîn nîşandan.

Komîteyê ragihand ku wan dixwest hîn bêtir fîlman bidin nîşandan lê ji ber cihê pêşandana fîlman kêman ew neçar mane hejmara fîlman daxînin.

Afiş û temaya festîvalê jî diyar bû. Di afîşê de wêneyê derhênerê kurd Yilmaz Goney û wêneyê Heskîfa di bin ava bendava Ilisûyê de dimîne cih digirin. Temaya bingehîn a festîvalê jî wek Heskîfê hat diyarkirin. Navê fîlm û derhênerên wan ên ku di festîvalê de werin nîşandan wiha ne:

Kurtefîlm

Veger - Selman Deniz, Fotograf - Ozan Takiş, Aralık (Kanûn) - Çayan Bilgin, Son Eylül (Payîza Dawî) - Gulsun Odabaşı, Ziyafet - Firat Ozeler, Avarya - Gokalp Gonen, Kargaman Aşman Gagası - Ferhat Ozmen, Barê Giran - Yilmaz Ozdil, Haziriyek Bo Derengmayîne - Aram Dildar, Kêm - Halis Saritag,



Bernameya Festîvala Fîlman a Yilmaz Goney hat aşkerakirin. Îsal di çarçoveya festîvalê de dê gelek fîlm bîn nîşandan û her wiha temaya bingehîn a festîvalê warê dîrokî Heskîf e

Kavil - Ozcan Alper, Duyuyormusun Anne (Tu Dibihîzî Dayê) - Tuna Kaptan, Kefaret Yagmur (Barana Kefaretê) - Veysel Çelik, Welatek Hebû - Hebûn Polat, Bang - Deniz Derya, Tor - Ragıp Turk, Stain - Shores Vakîlî, Şeker Gida (Zexîreya Şekir) - Freman Nain, Împaratorlukta Zor Bir Gun (Di Împaratoriye de Rojêke Zor) - Sezen Kayhan, Sevgi Dedigin (Tiştê Tu Jê Re Dibêjî Hezkirin) - Firat Yavuz, Cadi Uçlemesi (Sêbareya Pîrhebokê) - Ceylan Ozgun Çelik.

Fîlmên metraj dirêj

Borç (Deyn) - Vuslat Saraçoğlu, Zor Bir Karar (Biryareke Zor) - Ender Ozkahraman, Zer - Kazim Oz, Di Navberê De - Ali Kemal Çinar, Yuva (Hêlîn) - Emre Yeksan, Guvercin (Kevok) - Banu Sivacı, Guvercin Hırsızları (Dizên Kevokan) - Osman Nail Dogan, Görülmuştur (Hatiye Dîtin) - Serhat Karaaslan, Sibel - Çağla Zencirci û Guillaume

Giovanetti, İcerdekiler (Yên Li Hündür) - Huseyin Karabey, Hacivat ve Karagoz Neden Olduruldu? (Hacıwat û Karagoz Çima Hatîna Kuştin?) - Ezel Akay, Kiz Kardeşler (Xwişkên Hev) - Emin Alper.


Belgefîlm

Diyalog - Selim Yıldız, Ather - Ruken Tekeş, Kumun Gecesi (Şeva Xîzê) - Ali Ergül, Biraktigin Yerden '700 Hafta' (Li Cihê Te Hiştiye 700 Heftê) - Volkan Goney, Di Bîra Min De Ye - Soner Akalin, Bir - Veysi Altay, Prens Model - Dilan Engin, Tebeşir - Ozge Astan, War - Felat Erkozan, Siya Avê - Metin Yokus, Odisseias Ulkesinde Çikmaz Sokak (Li Welatê Odisseias Zaboq) - Serhat Ertuna, Miraz - Serdar Bayram, Her Mal Dibistanek - Ardin Dîren, Anemin Sinemalari (Sînemayên Dayîka Min) - Cansel Karacan, Amîna - Kivilcim Akay, Bakış Açısı - Mustafa Koksalan, Arkadaşım Çayan (Hevalê Min Çayan) - Hevalên Çayan. AMED

Zrîng bi berga Newrozê derket

Kovara xêzeroma a kurdî Zrîng ku Guzel, Eşref Mûmcû, Ercceren, Ender mehane tê weşandin, bi hejmara xwe ya 6'emîn gihîşt xwînerên xwe. Zrîngê di berga yekemîn de cih da Newrozê.

Kovar bi zaravayên kurmançî û kirmancî tê weşandin û her wiha li Ewropayê jî digihêje hezkiriyên zimanê kurdî. Di vê hejmarê de; İmam Cîcî, Dogan



Ozkahraman, Ronî Battê û Evdal Can xêz kirine.

Terstaqla Reco bi sernavê 'Agirê Newrozê' û Ozgur Amed jî bi sernavê 'Kolonyal Sedo' nivîsên mîzahî nivîsandine. Kemal Gokhan jî bi nivîskar Migirdîç Margosyan re hevpeyvîneke xêzî amade kiriye. AMED

Lêkolîneke rexneya edebî

Weşanxaneya Sîtavê pirtûka bi navê "Li Başûrê Kurdistanê Lêkolînek Li Ser Rexneya Edebî" çap kir. Pirtûk lêkolîneke li ser rexneya edebî ye û nivîskarê wê Rêbî Zêbarî ye ji başûrê Kurdistanê ye.

Mijarên pirtûka ku ji 191 rûpelan pêk tê, gotar û lêkolînên rexneyên edebî yê rojname û kovarên ku di navbera salên 1991-2003'yan de li başûrê Kurdistanê hatine çapkirin in. Her wiha kovara Peyvê (2003-2009) jî yek ji mijarên lêkolîna pirtûkê ye. Nivîskar der barê pirtûka xwe de axivî û diyar kir ku rexneya edebî beşek ji edebînasîyê ye û gelek qonax derbas kirine. Rêbî Zêbarî anî ziman ku rîstêke girîng a rexneya edebî di pêşkêfîna edebiyatê de her hebûye û ev rist hîn jî berdewam e. Zêbarî her wiha got ku heta niha gelek teorî derketine û her teorî jî bo sererastkirina şaşiyên teoriyên berî xwe bûne.

Rêbî Zêbarî da zanîn ku pirtûk

behisa dîrok û rewşa rexneya edebî ya kurdî ya li başûrê Kurdistanê dike. Zêbarî destnîşan kir ku armanca nivîsîna pirtûkê danasîna edebiyata başûrê Kurdistanê bi perçeyên din ên Kurdistanê û kurdên deverên din e.


Rêbî Zêbarî di sala 1991'î de li navçeya Akre ya bajarê Duhokê hatiye dinyayê. Di sala 2013'an de beşa Ziman û Edebiyata Kurdî ya Zanîngeha Duhokê û her wiha di sala 2017'an de jî mastera xwe li Beşa Ziman û Çanda Kurdî ya Zanîngeha Yüzüncü yıl ya Wanê xelas kiriye. AMED



Hevalê çak!

Bi demekê *Weşanên Kavramê* rêzê-pirtûkên giregirên helbesta cihanê çap kiribûn. Li jêr navê *Kavram Şairên Serzemîne* ku di nav de helbestkarên weke *Lorca, Desnos, Neşyal, Rilke, Ritsos, Bachmann, Kavafis, Williams, Bonnefoy, Reverdy, Gatsos, Trakl, Dario, Pavese, H.D., Quasimodo, Celan, Marti û Brecht* bi çî girtibûn. Dizayna bergê wan rêzêpirtûkan jî, dostekî min ê heja, Sadik Karamustafayê dizayner dabû ser milên xwe, wek editorê rêzê jî navê Erdal Alovayî derbas dibû. Di sêwirandina konseptê bergan de Sadik Karamustafa, dêhn û bala xwe dabû hunera kolajê (wek rê û dirbekî di sedsala 20'emîn de serê pêşîn bi destê Kubîstan, pê re pê re jî bi tîkîlbûna Dadaîstanê geş bûbû) û gelek bergên ku di hiş û hoşeyê min de çiyekî xwe yê taybet hebû, sêwirandibûn ku ev sêwiranên wî, sîd jî kolajên Kurt Schwittersî girtibûn.

19 pirtûk bûn û di sala 1995'an de hatibûn çapkirin. Li gor nivîsa li kujê rûpela pêşîn a pirtûka Eluardî (ya bi wergera Eray Canberkî), min ew wek set, di sernawê sala 1999'an de kiribûn û... xwendibûn. Ecêb e, ji nav wan rêzêpirtûkan, bi tenê rûpelên pirtûka Eluardî jî hev bûbûn, ne yek û ne dido, qey ji debûkana wê bû, formeyên wê, erê hatibûn dirûtin, lêbelê bi demê re, awayekî jî awayan jî hev belav bûbû. Bi tevî ku min carek-du caran formeyên feşkilî debûkan jî kiribûn (nişaneyên vedestekariyê diyar bûn), wer xuya bû ku nojdarîya min jî bi keri wê nehatibû. Lewra min kar û barên wisa dikirin. Di salên xwe yê nivîsê de, jî tewatirîna pirtûkên jî hev belavbûyî bigire heya bi pirtûkên ku li



Weswese 2

Şener Ozmen

ser bergê wan çî wêne û nexş û nimûr tune bûn, bi pênûsên xwe yê bihibir, bêyî ku tevayîya bergê biherimînîm û pirtûkê pûç bikim, ji xwe re - erê jî xwe re! - diresmandin. Heye ku ji tirs û şayîşa valahiyê bû ku bi tu teherî min ew di jiyana xwe de nedixwest, yan jî hevkarîyêke pêwîst bû wekî bi vê yekê, ez karibim qonaxa xwendinê jî xwe re rengintir bikim. Vê nêzikê-dayîna han, piştî demekê li hemberî hemû tiştên tîkildarî dîbariyê - xasma jî dîbariya li cem Kurdan - dom kir; çî li welêt çî li derveyî welêt. Ji pergala kovaran bigire heya bi sêwirana bergên pirtûkan û hündürê wan, ji neqandîna qerekerên nivîsê yê li ser camekanan bigire, heya bi kitekîte yê malperan, wek Eliyê xemxûr, ji min re dibûn kul û derd.

Yek ji wan pirtûkan - yê jî ber destên tîmên taybet filitî - ya *Tomurcuik Erzîkê* bû, *Zamanî Vurdular*¹, a dinê jî ya *H. Magnus Enzensberger* bû, *Titanic'in Batışı*² ku li jêra îllustrasyonan, min navê xwe jî danibû ku beriya bi çend rojan, di çavgerandîneke li pirtûkxaneya xwe de, di refikên pirtûkên helbestan de pêgî wan hatibûm. Bi coş û perşeke zarokane, min ew şanî kurê xwe jî dabû bi van gîlgotinan; "Aha min tiştên wehakî çêdikirin hê gava ez xwendekarekî lîseyê bûm..." Yek nîgar, dido helbest, bandora van herdu awayên derbirîne, bi tevî jiyana fetsînok a li Hezexê (wek tiştên tîkil-



darî man û nemanê) û helwêsta hunerkuj a mamosteyên min ên li zanokoyê, heya roja îro jî berdewam e. Û Eluard, çî bigire, min bi dehe caran pirtûk xwendibû, xasma jî helbesta wî ya ku sernavê wê bixwe jî helbestek bû ya ku bi vê malikêdest pê dikir; "Bi gîştî min ew cegernînekekî li diwarojê bifikirim..." Nîha ku gîlî serê lodê girtiye, dikarim bibêjim me çu diwaroj nîne! Lêbelê, tişteke heye ku hiş û bîra kurdan, bi dû her tîkîlê de teteletelê dibe. Em bûne civakeke bîreş, mixabin, sed carî mixabin, me neşîya jî tiriyekerkuy mey, jî rejîberî êgir, jî ramûsananan mirov çêbikin... tekane zagona me ya germ bûye hesabên (bibexşînan malikên) me yê di banka-yên dewletê de. Ka, jiyân çî dame, çî da we! Û em dizanin wekî çu tişt - serfirazî jî tê de - dê nikaribe wê valahiya tîrsnak a xwîne (xwîna kurdan) binixumîne. Çî ku;

Du mijarên sivik

*Min çaktirîn bevalê xwe
Wexta ku kolanên bajêr tevîr dikir dit
Êvarekê di hemû keuçeyên bajêr de
Min ew dit wekî çawan serdaba dirêj a
qederê dikole*

Digot û dilûband di ber re Eluard, wekî ku qala reştariya reşê xwe jî kone-tiyê, tariya xwe jî debengiyê girtî bike, qala vî bajarê mîtehitî, tevirkolan, zimangezan, bedenbazan, diz û pîzên pêşerojê (pêşeroja me), qala vî bajarê ku îro zimanê serdestên xwe jî xwe re kiriye darbinçeng û li kuçe û kolanên ku bihost bi bihost ketiye mazatê, piyase dike, qala kurdên hemû dem û dewranan, yê hemû şahînetan, yê hem li tîxan dixin û hem li mixan, bike. Rastiye bibîne, lê ne-nivîsîne! Tiştê ku ji me tê (dihat) xwestin ev e (ev bû). Xwesteka jiyaneke

xweş û rengîn, ji daw û doza jî yê ku çaxa ev bajar serobino hev bû, bi dû parastin û bi dû de jî lêzedekirina destkeftiyên xwe yê jî şer û pevçûn û tîkîlê mayî ketine, saf û sade nîne. Ez



ê çî bi ferhenga vî bajarî bikim, ya ku dike hûrhêra bibe peyvên wê yê nemirneji di nav destên min de? Ez ê çî bisêwirînim li ser bergê wê yê camîn ku her tiştê ku rizîyaye, dibînî de dibînim?

Andre Gide bû yê ku gotibû bir û boçûnê min tim û dayim di rengê cil û bergên min de ne. Ji tiştêki re nabin ên bêreng! Çî ku bêrengî, ne zelalî ye.

Çapa Duyem

Pêşengeha bi navê *Li Ber Pêşreva Amedê Bi Hev Re û Bi Tenê*, bi ko-kuratoriya Mîsal Adnan Yıldız û Dicle Beştâşê, bi beşdariya hunermendên amedî û yê ne amedî lê dijin, wek Servet Aslan, Ceylan Çiftçi, Nazlı Ergen, Nadan Ozcan, Zelal Ozkan, Eylem Sayın, Bahar Tokur, Evîndar Tokur, Neşe Toprak û Mazlûm Yaşarî, li A4 a cigêhê hunerê (8 Sernawez -15 Berfenbar 2019, Amed) li dar ketibû. Di pêşengehê de gelek kar û barên ku poz li vewhendiyên xwe hîlnedidan (wek hin hunermendên me yê di ber pişîka xwe re diçûn), çî girtibûn ku yek ji wan jî, kevalên hunermenda kurd Zelal Ozkanê bûn. Zelalê, di her sê kavalên xwe de jî, li ser dimênên kesîbiyê hûr bûbû, yê ku feraset li me tîk dibir. Pêşengeh, li jêr navê *Çapa Duyem*, niha, li "Depo"ya li Stenbolê ye, jê nemînin.

¹*Zamanî Vurdular (Bera Demê Dan), Tomurcuik Erzîk, Yaşın Yayınları, sala çapê nebatîye nivîsandî.*

²*Titanic'in Batışı (Noqîna Titanîkê), H. Magnus Enzensberger, Tirkîya wê: Sezer Duru, Cem Yayınevi, 1983.*

Di 8ê Adarê de li hemû qadên jiyane

EM DI AZADIYÊ DE BI ISRAR DI TÊKOŞÎNÊ DE BI BIRYAR IN

Em hang
li hemû jinan dikin
ku di 8ê Adarê de
em berxwedana xwe
mezin bikin, hêviyên
xwe zindî bihêlin û li
hemberî iktidarên ku
jiyanê dorpeç dikin
em dakevin
qadan.

Ji ber krîza aborî **em bêtir xizan dibin** û li hemû deveran keda jinan nayê dîtin û di hemû krîzan de dîsa **jin bê kar û bê pêşeroj tên hiştin**. Em her roj û li her derê rastî tundiya mêran tên. Ji ber şer, dagirkerî, tecrîd, hepiskirin, xespkirina îradeyê û politikayên tundiya zayendî ku bi destê hêzên ewlekariyê tên meşandin, **jiyana hevpar a jinan û piştevaniya me hedef tê girtin**. Rêgeza me ya temîliyeta wekhev û **pergala hevserokatiyê hedef tê girtin**. Li hemberî dorpeçkirin û zextan çalakiyên me bi dawî nebûn, gotinên me naqedin. **Me dev ji têkoşîna azadiyê berneda û bernadin!** Me tu caran dev ji kolan, siyaset, axaftin, çalakî, nivîsandin û bi kurtasî dev ji berxwedanê berneda û me 'notaya berxwedanê' neqîşand dilê xwe.

